
# ROJA NÛ

kovara huneri çandi û edebi



26
1989

## NAVEROK

Nameyên Xwendevanan ........................................ 3
Jı bo biranina Yılmaz GUNEY ........................................ 4
Konferansa Parisê ........................................ 5
Çend Çarin- BARAN ........................................ 7
Sistema Şaxê Stranên Gelêri yênKurdên Ermenistana Sovyetê/2- Nûra Cewari ........................................ 8
Jı Gernama Ewliya Çelebi ........................................ 11
"Mın idam bıkın ji ez Kurd im" ........................................ 15
Dı pêncsaliya mırına CİGERXWİN da ........................................ 16
Lı Danimarkayê Hefteya Çandi a Kurd çêbû- Jiyan ........................................ 18
Serpêhati: Evina dıl, evina welat- Newroz ........................................ 20
Tiyatro: Welatê mın dı dılê mın da ye/2 Kerstin Erlandsson-Svevar ........................................ 25
Cıvina 35:em a Asembleya Yekitiya Ewrûpaya Rojava, bıryara Xudmuxtariyê jı bo Kurdan ........................................ 28
Doktor bangi doktoran dıke ........................................ 29
Quncıkê Zarokan ........................................ 30

هەوالنامەی کتێب

**Lı ser bergê pêşin:**
**Didemek jı çemê Diclê lı Hesen-Keyfê**

**Sal: 11**
**Hejmar: 69, Çıleyê paşin 1990**

ISSN 0283-5355

**XWEDİ:** KOMKAR-Swêd
**BERPIRSİYAR:** Şêroyê BOTAN
**NAVNİŞAN:** Döbelnsgatan 16 B
113 58 STOCKHOLM
**TELEFON:** 08/ 328251
**HESAP NO:** PG. 458980 - 0

**UTGIVARE:** Svensk Kurdiska Arbetarföreningen
**ANSVARIG UTGIVARE:** Ş. BOTAN
**ADRESS:** Döbelnsgatan 16 B
113 58 STOCKHOLM
**TELEFON:** 08/ 328251
**PG:** 458980 - 0

# NAMEYÊN XWENDEVANAN

Bo Redaksiyona Roja Nû:

Germtırin rêz û sılavên şoreşgeri û tıji xoşwani, jı çiyayên Kurdıstanê, jı çeperê mêrxasi û cangorikırınê, jı nav gul û sosın û çimenên Kurdıstana rengin û jı nav refên bask û hêza gel "Pêşmerge" pêşkêşi we hevalên karbıdest ên Roja Nû dıkım. Hivi û daxwaza mın ew e ku, dı kar û barê xwe da serkevti bın.

Ez pêşmergeyeki Partiya Demokrat a Kurdıstana İranê (P.D.K-İ) me û lı refê şorışê dı xebata çekdari dıkım. Her dı vi hali da ji, lı ber roniya rêbaza partiya me ya pêşeng, me baweri bı xebata çandi ji heye û diyar e, pêşewayê vê yekê ji şehidê mezın, rêberê navdar Dr. Qasımlo bûne.

Ez dıxwazım dıgel we pêwendiyê saz kım, û tıştê jı destê mın bêt (wek: nıvis û werger) teqsiriyê nekım. Jı ber wê hındê, daxwaziya mın jı we hevalên dılovan ew e ku, hun ji alikariya mın bıkın, belku ez ji bıkarıbım bıbım xızmetkareki çanda gelê xwe û dılopek jı wê derya mezın.

Hividar û dılxwazê serkevtına we me.

Dıgel sılavên dubare.

**E. Kırmanc**
89.11.16

Jı xebatkarên "Weşanên Roja Nû" ên hêja ra:

Weşanên ku we jı me ra şandıne, gıhiştın destê me, em geleki pê dılxweş bûn. Bona eleqeyên we yên nêzik, ez lı ser navê hevalên xwe, spasiyên xwe yên jı dıl, pêşkêşi we dıkım. Û dı têkoşina we da serkevtınên bılındtır daxwaz dıkım.

Jı bo berdewambûna têkoşinê-dı hemû şert û hoyan da-, bo pêkanina KURDISTANA serbıxwe, TIRKİYE û DINYAYEKE serbıxwe, kaniya hêz û zaninê pırtûk ın. Ew wergerên we û klasikên zanısti ne, ku hûn bı awayeki heri baş dıgıhinın destê me. Hın jı wan weşanan, bı taybeti sê heb jı wan, geleki bı kêri me hatın. Tam lı gor sewiya me û bı zımaneki sıvık hatıne nıvisandın. Lê kêmasiyekê bala me kışand: Tunebûna ferhengeki jı bo hın peyvên nenas ku jı aliyê mane da, jı me ra xerib ın. Eger ferheng hebûya wê karê me hêsantır bıkıra. Disa ji em jı eleqeya we ra zahf spas dıkın, û berdewamkırına vê pêwendiyê hivi dıkın.

"Bı xatırê we" *(Bı kurdi)*

**M. Erdem**
Sağmacılar Cezaevi, **Stembol**

*(Name jı tırki hatiye wergerandın.)*

Jı xebatkarên Roja Nû ra:

Hevalên hêja, wek welatparêzeki Kurd û xwendevaneki Roja Nû ez sersala we û hemû welatparêzan pıroz dıkım û hêvidar ım ku sala nû jı bo gelê me bıbe sala serkevtın û ronahiyê.

Hevalên hêja ev du sal ın ez kovara Roja Nû dıxwinım. Ew jı mın ra bû alikariyeke mezın, dı xwendınû nıvisandına Kurdi da. Her car ku kovarê dıgrım destê xwe, şabûnek dıkeve dılê mın. Lê gelo hûn nıkarın wê mehê carekê derxın? Wê geleki baş be heke hûn cih bıdın xaçerêz û ferhengeke Kurdi-Tırki ji. Xasma jı bo hın nıvisên Kurdiya jêrê (Sorani) ferhengokek hewce ye.

Disan bı dıl û can sılavên bıratiyê lı kovara Roja Nû dıkım û hêvidarım hûn van pırtûkên lı jêr, jı mın ra bışinın. Ezê bedêla wan wexteki kurt da bışinım.

**F. Laçin , HOLLANDA**


**EM SERSALA XWENDEVANAN PİROZ DIKIN Û HÊVİDAR IN KU SALA NÛ JI BO GELÊ ME BIBE SALA TÊKOŞİNEKE SERKEVTI Û RONAHİYÊ**

**ROJA NÛ**

Dı pêncsaliya mırına xwe da

# YILMAZ GUNEY

## Dı dılê milyonan da, Dı têkoşina Gelê Kurd da Dıji



Rejisor û hunermendê sinemayê ê bı nav û deng, welatparêzê Kurd Yılmaz Guney, pênc sal berê dı emreki kemıli û gıhişti da wefat kır. Mırına wi xem û êşeke mezın xıste dılê gelê Kurd û hezkırıyên wi. Guney bı hunera xwe ya şoreşger, lı hember hêzên kolonyalist, lı dıji neheqiyê, lı dıji kedxwariyê û zordestiya netewi lı ser gelê Kurd, bı camêri şer kır. Wi lı ber zordesti, dıjwari, êşkence û zindanên dıjmın stû xwar nekır. Dı efrandınên xwe da, bı rık jiyana xelkê, derd û problemên cıvaki ani zıman. Lema ew dı çavê xelkê da bû mêrxaseki hezkıri.



Ew çawa pêşewayê sinema rastbin(realist) û şoreşger bû dı sinema Tırkiyê da, wısa ji hunermendê Kurd ê yekem bû ku bı filma xwe "YOL" dengê gelê Kurd û navê Kurdıstanê bı awaki fıreh gihande hezkırıyên sinemayê ên cihanê.

Wek tê zanin raydana filmên Guney lı Tırkiyê û Kurdıstanê hatiye qedexekırın. Jı 12'ê ilonê sala 1980 hetani nuha 189 film hatıne qedexekırın ku, jı wana dı bınê 114 heban da imza Yılmaz Guney heye. Dıjmın bı qedexekırın û şewıtandına filmên Guney, dıxwaze navê wi û xebatên wi bıde jıbirkırın. Lê dewleta Tırk a zorker û hov xwe dıxapine. Ew jı zûda bûye mêrxaseki gel û dı dılê milyonan da dıji. Ewê dı çand û hunera gelê Kurd da, dı têkoşina wi da her bıji.




# KONFERANSA PARİSÊ

Dı navbera rojên 14 û 15'ê meha çıriya Pêşin da, lı Parisê bı navê "Kurd, Mafên Mırovati û huviyeta Kulturi" konferansek navnetewi hat darxıstın.

Koferans dı bın paraztına Danielle Mitterand da jı aliyê Enstituya Kurd û Weqfa "France-Libertès" va hat amadekırın.

Konferansê çı Kurd, çı biyani gelek kesên politik, alım, rojnamevan û wd. lı hev cıvandın. Jı wan beşdaran gelekan lı ser pırsa Kurdan û Kurdıstanê ditın û raya xwe anin zıman. Wek : Sti Mitteranan û wezirê fransi Kouchner, ku herweha rêvebır û qısedarên Konferansê ji bûn, serokê Komisyona Pêwendiyên Derva ya Senatoya DYA Claiborne PELL, her disa endameki vê komisyonê senator Peter GALBRAİTH, serwera Komita Helsinki"yê sti Jerry LEBER, serokê Grûba Mafên Mırovi Ya Parlamentoya ingilizi Lord AVEBURY, yek jı Professorên Universita Sorbun Maksime RODİNSON, jı Swêdê serokê kevn ê Amnesti International, Thomas HAMMARBERG, Muxalıfeki rejıma Iraqê Selim FAHRİ, Wezireki kevn ê Ceziyirê Huseyin AİT, jı Yekitiya Sovyet, pısporê diroka Kurd Prof. LAZAREF û Prof. Nadir NADİROF (bı eslê xwe Kurd).Mehmûd OSMAN (lı ser navê Bereyê Kurdıstan-Iraq) , Kemal BURKAY (Sekreterê gıştı ê PSKT), Hasan ŞERİFİ(Berpırsiyarê Ewrûpayê ê KDP-İran) û hwd.

Nuner û serokên partiyên hemû parçeyên Kurdıstanê, dı cıvinê da, bı navê xwe beşdar bûn, pıştgıriya Konferansê kırın. Hın jı wan wek qısedar beşdar bûbûn.Dı hundurê welat da ji, welatparêz û ronakbirên Kurd û Tırk



Jı parlamenterên Kurd yên ku tevi konferansê bûne

e leqake germ nişani Konferansê dan. Jı wan hın kes hatın, dı Konferansê da cih gırtın. Dı nav wan da 8 parla-

menterên Kurd ji hebûn. M. Ali EREN, İ. Hakkı ÖNAL, Kenan SÖNMEZ (parlamenterên Stembolê), Ahmet TÜRK, Adnan EKMEN (Mardin), Mahmut ALNIAK (Qers), Salıh SUMER (Diyarbekır) û İbrahim AKSOY. Aksoy lı ser rewşa Kurdan axaftıneke balkêş ji kır.

Konferansê propagandeke baş kır ku mesela Kurdi bêtır bıkeve rojevê. Dıjmınên gelê Kurd jı ber vê yekê xwe geleki acız kırın, lı dıji wê, bı riyên dıplomatik gazın û nerazibûna xwe jı hukumeta Fransayê ra dane xuyakırın.

Radyo, TV û rojnameyên Tırkan bı şırove û tevsirên şovenist lı ser Konferansê sekının. 8 parlamenterên Kurd kırın hedefa brûskên şoveni.

Serokên partiyên siyasi yên Tırkiyê, Konferans ji, parlamenterên ku çûbûn Konferansê ji rexne û gunehbar kırın. Mesela Ecevit şoveniya xwe vereşiya û got: "Çûyina 8 parlamenteran bo konferanseke wısa, onura me şkandiye û ev tavizek e, jı prensiba serxwebûnê". Pır nebuhuri serokatiya Partiya Sosyal a Gel (SHP) ji dı nav vê propaganda yê da cih gırt û şovenizma xwe lı dıji gelê Kurd aşkere kır. SHP"ê çûyina parlamenterên Kurd bo Konferansê mehkûm kır û ceza da wan. Heft parlamenterên Kurd (İbrahim Aksoy berê jı vê partiyê hatıbû derxıstın.) jı partiyê hatın ixrackırın.

Vê bûyerê dı nava endam û dılxwazên partiyê da, xazma dı nav Kurdan da û dı nav Tırkên pêşverû da, lı dıji vê şovenizma han protestoke xurt peyda kır. Bı dehan parlamenter û bı hezaran endamên partiyê jê qetiyan.

Rejima faşist ji çend sal e ku cehd dıke ku pêşiyê lı hışiyarbûna gelê Kurd bıgre, lê her çû baweriyên pêşverû û welatparêz dı nav gel da kok da û bıngeheki fıreh gırt. İro çı dı nav welat da, çı ji lı dervayi welat , doza netewa Kurd, dı platformeke fıreh da tê mıneqeşekırın û naskırın.

Wek me lı jorê da xuyakırın, bı tevayi merıv dıkare konferansê wek gaveke baş bıbine. Lê pêwiste em kêmasiyên wê ji binın ber çavan ku karıbın pêşiya wan bıgrın.

Kêmasiya pêşin: Nuner û serokên rêxıstınên siyasi, ne bı navê rêxıstınên xwe, lê bı navê xwe hatıbûn bankırın. Ev kêmasiyeke gıring e. Jı ber ku xebat û têkoşina rızgari û azadiyê tenê bı rêberiya rêxıstınên siyasi dıkarın bı serkevın. Heta nuha tu nımûneyek tuneye ku bê tevger,tenê bı hın organizasyonên demokratik welatek azad bûye, an ji zıman û çand xılas bûye.. Dı pırsên siyasi da, pêwiste organizasyonên siyasi muhatab bın.

Ya duwem: Dıvê bêt zanin ku Welatên Rojava'yê, lı ser pırsa Kurdi, kingê dılê wan dıxwaze, lı gora dılê xwe, gotubêjan dıkın. Lê xwediyê pırsê ên esasi rêxıstınên Kurdi nayên naskırın. Ev yeka han rê dıde wan ku lı gora şertên xwe meselê rexne û şırove bıkın.

Ya sêwem: Bıryarên ku dı Konferansê da hatıne standın ji geleki lı paş ın. Ew lı gora dılê amadekarên Konferansê ne. Jı daxwaz û armancên gelê Kurd dûr ın. Dı bıryaran da, wek mıllet behsa Kurd û Kurdıstanê nayê kırın. Ev tışt bı gotına "Kurdên ku dı navbera çar dewletan da hatıne parçekırın" tê derbazkırın.

Konferansê tışteki dın ji baş da xuyan, ku peywendiyên abori beri yên mırovtiyê ne. Jı ber ku nunerên dewleta Fransız dıxwastın ku nunerên Saddamê xûn-mıj ji dı Konferansê da wek ali cih bıgrın û ditınên xwe bêjın. Lê bı protestoke xurt, bêçare man û salon terk kırın. Hukumeta Fransız, jı aliki va dıxwaze bı cıvineke weha dılê Kurda bıgre, û jı aliki va ji dıxwaze dewleta Iraqê ji jı xwe dûr nexine. Naxwaze ku "Ne şiş ne ji kıbab bışewıte".

Dı amadekırına cıvinê da, bı zanebûn rol nedane rêxıstınên siyasi. Jı ber vê yekê ye ku rêxıstınên siyasi dı vê cıvinê da bê insiyativ mane.

# ÇEND ÇARİN

BARAN

Heval jı kar bêzar bû, çû hat, gıli gazın kır
Jı rengê bê, jı dengê berfê, bıçûk mezın kır
Revi çû lı dawi, bû beredayi, ne kar
Ne bar êdi, lı stû revoki mina bazın kır

***

Jı bo darên hışkbûyi xem neke hevalo, yên nû dayne
Gotın fêkiyê arıfan e û delaliya bexçe bı bexçevan e
Rêber ev ın ku hımber çetnaya xwe wında nakın
Riya hêviyê berjêr û berjor e, bı sınc e, jahr û jan e

***

Hoste ku bı xwe bawer be, wê çıbke xweşgotın û pesnane
Hêjaya gewher pêra ye, mırari ne hewcedari telalan e
Mar heye hûr e, lê zorjahr, gul heye bihn dıde wek hezar
Şıêra xas ji bêdeng e lê agır û pêt e, tirê dılan e

***

Jiyana me hat û çû bı qal û qır, hay û hûy ü ceng ın
Rındi çı ye, rasti lı ku ye, bextewari çı reng ın?
Herçıqas lı vê dınê, heval, dost kêm, bêbext zef ın ji
Roj fêkiyê şevê ye, fırehi lı pışt dırbên teng ın

***

Roj wek çıvikên payizê çûn, lê venagerın
Darên emr xezal dıbın, çı bı ber, çı bê ber ın
Yên ku barê xwe kışandın, kılama xwe gotın
Bı giri hatın dınyayê, bıla dılşad herın

# Sistema Şaxê Stranên Gelêri Yên Kurdên Ermenistana Sovyetê/2

**Nûra CEWARİ**

Dı şinê da gelek stranên cuda tên xwendın. Ev stranên han bê hazırı, hema dı şinê da tên afırandın û gotın. Vana stranên gıriyê ne (dirok, nêvejok), stranên diyalogê ne. Dıxwazım bala we bıkşinım ku, bêtıri van stranan qerekterê dılpaki û carna ji yê mêraniyê nişan dıdın. Naveroka van stranan biranina mıri û pesnê malbata wi/wê ye. Stranên şinê bı qerekter û avabûna xwe nêzi stranên Diroki û Mêraniyê ne. Hınek jı van stranan berdewamên Sedsala Navin ın.

**Stranên Eşqê**

Hunermendiya stranên eşqê yên Kurdên Ermenistanê, wek stranên eşqê ên gunditiyê belav bûne û ev stranên han dı hunermendiya stranên eşqê yên Rojhılata Navin da ciheke bıngehin gırtıne.

Stranên eşqê yên afırandi (bı nıviski yan ji bı kaset) hınek nêzi stranê gundiyan ên Lawıj ın. Hevtêkılıya stranên eşqê û stranên gunditiyê, dı avakırına helbest û prensibên melodiya wan da tên xuyan. Jı hev cudabûna van stranan, dı naveroka teksta helbestê da ye ku, dı peyv û melodiyê da ciheki fıreh daye heyecana ruhi û ev ji bı şertên avakırın û strandına wan va gırêdayi ye. Dı van stranan da hisên şabûn û hezkırınê gelek xurt ın û ev babetên han dı stranên gunditiyê de kêm tên xuyan. Stranên eşqê gelek caran hunera teşbih û pesın bı kar tine. Melodiya van stranan bı şıklê nişandana xwe, jı stranên dın cudabûna xwe dıdın xuyan. Ev stranên han bı qonaxên xwe fıreh ın, bı sıvıkayi dıtewın û bı harmoniya xwe guhêrbar ın. Bı muzika xwe ji, nêzi efsanên Yewnani ne.

*Lêlê dinê,*
*Mın xulama ci-mıkanê tu lê, ê hê...*
*Dılo, lo, belengazo,*
*Mın (bı) çavê serê xwe di,*
*Bıbbılê malşewıti dıxwûne jı xwe û hala re,*
*Bû mêvanê Gulê, dılo wi, wi, wi, wi, wi,*
*Mereza mı(n) yar, yar, yar, yar, yar, yar merezê.*

*Lêlê dinê,*
*Bıra awırê te nekeve kêlê kevıra, koka dar û bera,*
*Xelq wê bırindarê şûra, rıma, gullan û gemane,*
*Evê teresê ezê bırindar kırıme,*
*Bı awırê belekçavê, gılya û gotına, van xebera wi, wi, wi,*
*De yar, yar, yar, yar, yar, yar, yar merezê.*

**Şaxa Ruhi**

Dı nav stranên afırandi yên Kurdi da stranên ruhi, yek jı stranên kevneşopiyê ne. Me heta iro lı ser muzika ruhi yên Kurdên Yêzidi lêkolin kıriye. Me jı nav stranên ruhi, şaxa **Qewl** daye xuyan.

Dı vana da lı ser pêxemberê Yêzidiyan Şêx Adi, lı ser melayiketên wan û lı ser pesnê ola Yêziditi tê stırandın. Teksta wan jı 3 an 4 rêzên ritmik pêk tên.

Doktorê zımanzan Q. Kurdo, teksta Qewlan ên ku jı gel hatıne bıhistın û nıvisandın daye ber tekstên Qewlan ên ku dı pırtûkên oli yên Yêzidiyan û gıhiştiye vê encamê ku, tekstên Qewlan ên ku jı gel hatıne bıhistın varyantên tekstê pırtûkên ruhi ne. Ew bı xwe ji daye xuyan ku, nıviskarê van pırtûkên ruhi bavê Yêzidiyan Şêx Adi ye. Şêx Adi merıveki entelektuel û zanayê dewra xwe bû..

Ev agahdariyên han nişan dıdın ku, Qewl a profesyonel dı Sedsalên Navin da derketıne meydanê.

Qewla "Ez zêreki safi me", bı formeke diyalog çaxê derketına ılmê Şêx Adi dıde naskırın.

***Zêreki safi gursım,***
***Hatına xwe da hêrsım,***
***Hatıme ber riya Şêx Adi,***
***Donzdeh mena (ji) te dıpırsım.***

***Ne Adem bû, ne Hêwa,***
***Ne zêr bû, ne ba,***
***Hıngêva ew caw da.***

***Xaniyê me dêre,***
***Hatına we nakım inkêre (inkare),***
***Sed cari bı xêre.***

Qewl, jı ali pêşandana muzik va cuda ne. Dı hınekan da destpêka melodiyê babeta serek ye, lê dı yên dın da ji gotın babeta sereke ye. Melodiya Qewlan bê muzik û bı şıkleki fermi tên strandın ku, bı vi rengi jı stranên Gunditiyê cıhê dıbın.

**Stranên Bajarvaniyê**

Stranên Bajarvaniyê, dı muzika Kurdi ya gelêri da beşeke heri nû ye. Ev stranên han, lı Kurdıstanê, bı zêdebûn û pêşveçûna bajaran derketıne holê û belav bûne. Ev pêşketına han ne tenê bı bajaran va gırêdayi ye, her weha bı geşbûna zanebûn û hisên netewi va ji gırêdayi ye. Stranên bajarvaniyê lı ser peyvên gelêri û şiêrê helbestvanên pıspor ên Kurd tên afırandın. Gelek caran muzika van stranan jı ali afrandarên wan va tên çêkırın. Stranên bıjare yên bajarvaniyê dı nav gel da gelek tên hezkırın.

Naveroka stranên bajarvaniyê, welatperweri, evini û rewşa jiyana insan e. Bıngeha melodiya van stranan ne zehmet ın. Car bı car tên guhartın, ritm û peyvên wan tên vegerandın.

Stranên bajarvaniyê yên heri populer, stranên Aram Tigran, Şıvan û Gulistan ın. Dı nav stranên afırandi yên Kurdên Ermenistanê da, hêj ji bı navê "beyt" stranên Sedsala Navin hene. Ew bı naverok û tekstên xwe, varyantên şiêr û qesidên şairên Kurd ên populer ên Sedsala Navin ın. Hebûna varyantên profesyoneli û gelêri yê helbesteki, qerektera çanda Rojhılati nişan dıde.

Dı bıngeha beyta "Glavi" (navê keçekê ye) da lı ser evinê efsaneke xweş heye. "Mir Atlas, jına xwe ya cıwan lı cem jına xwe ya mezın dıhêle û bı rê dıkeve. Jına Mir Atlas a mezın, jehr dıde Glavi

(navê jına cıwan). Mêrê Glavi, lı ser laşê wê dıgri û lavayiya dıke. Pıştı gıri û lavayiyan bı saya kerametê Şêx Adi, rıh dıkeve Gılavi. Glavi serpêhatiya xwe, jı mêrê xwe ra dıbêje û cardın dıkeve xewa gıran a ebedi."

***Sed heyfa mın tê (lı) çev buriyê belek, dêmê narin,***
***Mori mırcan, karûbarın,***
***Ax, dılo bıra hûnê saxbın,***
***Ew ji çûne nav ax û berê gorane tari.***

Ev strana hana jı ali mırovên ruhani, dı çaxê gorkırına jınan da tê xwendın. Jı bo melodiya parçên mezın ên beytan qerekter ew e ku, beyt bı stran tên xwendın, bı nermayi tên tewandın, xwedi ritmeke xweş û guhêrbar ın. Bıngeha muzika "eolisk" (muzika Yewnani ya kevn) rengeki taybeti, dılşahi û lirik dı merıv da peyda dıke.

Beyt wek Qewlên Ruhi, bı xusûsiyeta muzika gelêri, avahi, stil û xasıma bı strandına xwe jı stranên kevneşopi vedıqetın. Bêguman ev nişana profesyoneli ye, ango şıklê efrandına van stranan bı profeyoneli ye ku, bı riya stranên gelêri, bı zargotıni gıhiştıne me.

Bı tıştên ku heta nıha me rawe kır, bersiva sistema şaxê stranên Kurdi bı temami nayê dayin. Bêguman lı ser vê babetê domandına lêkolinan, wê sistemê dewlemendtır bıke. Jı bo ku merıv bıgıhije encameke tekûz, pêwist e ku lı ser stranên gelê Kurd ên her çar parçên Kurdıstanê û Kurdên Yekitiya Sovyet -Gurcistan, Azerbeycan, Tırkmenistan, Kırgızistan û Qazakıstan- lêkolinên gıranbuha bête kırın.

Karên weha fıreh û gıran wê bersiva gelek pırsên nû bıde; jı bo muqayese, têkılı û xusûsiyetên stranên Kurdi mecal peyda bıke.

DAWİ

Werger jı Rûsi:
**Azad Hesen Cigerxwin**

■



## Jı Gernama
# EWLİYA ÇELEBİ



# ŞER

Werger: DILSOZ

Bı şeveqa 24'ê meha Remezanê ya hezar û şêst û pênc (28 Tirmeh 1655) ra çawışên ordiyê bı banga "tembih" (balkêşi) derketın û geriyan.

Hemû esker lı hespan sıwar bûn û jı bo ku berbı nawendên kıfşkıri herın, ku jı ali pısporên kar va hatıbûn nişankırın, hemû serbaz hatın konê paşa. Pışti wergırtına duayên xêrê yên paşa herkes bıryara çûndına cihên kıfşkıri stend. Lê bı şevê hemû çekdar berbı pêş çûn û xwe dı keminan da veşartın. Lı ba paşa heşt hezar çekdarên yeniçeriyên dergevan, sekban, sarıca û peya mabûn.

Peyayên dın ji, çûbûn kozıkên xwe yên kıfşkıri. Begê Mehmûdiyan tevi heşt hezar eskerên bıjare çûn mılê rastê, Begê Melazgir tevi şeş hezar mêrxasan çûn mılê çepê, Şeref Begê Mehmûdiyan û Begê Beyazidê tevi şeş hezar mêrxasi çûn mılê navin. Begên Erciş, Adılcewaz, Mûş, Kûrûcan, Pasin, Avnik, Xınıs lı ali rastê; eskerê Begên Karni, Hiyron, İspırıd, Meks, Servi, Kesan lı ali rastê; çarkavanê (dı ordiya Osmaniyan da eskerên pêşewa yên ku dorê lı dıjmın dıgrın) Hekkari Paşa tevi dozde hezar esker, lı pêşberi ala yuruk bû pêşengê esker. Serbazên Kurd ji, tevi deh hezar esker, hemû xızmetkar, seyis, serac, sıwarê deveyan, meşalevan, ordivan û bazarvan dı nawenda ordiyê da bı navê "bınê sitılê" man û lı dora ordiyê wek mıfırze hatın tayinkırın.

Cihê ordigehê hate tekûzkırın û mılê rast û çepê fermandarê Wanê lı ali rast û çepê Paşa amade bûn. Peyayên Kela Wanê, eskerê kelên dın, eskerên peya yên Hekkari, şeş hêzên yeniçeri, zırxvan, topavêj, eskerên keli û nêzi dozde hezar eskerên peya wek bist û heşt parçe hêz bı rêz bûn; pênci topên şahi, deh kolomborne û çar topên balyemez hatın amadekırın û bı navê "başlı, taşlı, Heseni, Huseyni" eskerên bıjare lı rast û çepê van topan hatın tayinkırın da ku pê ra hêdi hêdi bımeşın; sê hezar eskerên canfida ji, lı dû van hêzan hatın tayinkırın.

Pışti amadebûna eskerên Paşa, dı nava sê saet û niv da wek derya esker ji hatın bı cihkırın. Paşa zırxê xwe lı xwe kır:

"Serdarê çiyayan zırxan dıde lı xwekırın da ku nişani dıjmın dım ka merıv çawa laşê xwe dıde ber zırxan."

got û şûrê xwe yê tûj lı pışta xwe gırêda û dı konê xwe da du rekat nımêj kır. Pışti ku sılav da: "Ya ilahi, jı bo xatırê hebibê xwe, jı bo xatırê merıvên xwe yên piroz, eskerê islamê jı şaşi bıparêze." got û pê ra ji ferman da ku dest bı "xwendına fetha piroz bıkın!". Pışti vê fermanê hemû bı yek dengi strana fethê (dagırkeriyê) xwendın û heta ew (paşa) bı xwe ji, dı nav da wek teyrê tawus lı dora xwe çû û hat û lı saeta xwe nıhêrt, "elhemdûlillah" got û pê ra ji dı bın siya kon da:

"Ey sıwarê hespên bı naz, bes
Meydana şer ê te ye piyê xwe bı mêrxasi deyne."

got û lı hespê xwe yê Ereb sıwar bû. Hemû çawışên diwana Wanê:

- Ew riya ku te daye ber xwe lı te piroz be, Xwedê te serxe, Xwedê emır bıde padişahê me, tu û dewlet her bıjin! gotın û lı çepıka xıstın.

Paşa dı meydanê da bı hespê xwe çok da şıkandın û lı rast, çepê çû û hat û sılav da hemûyan. Xelkê herdu aliyên wi bersiva sılava wi dan û "Xwedê işê te sererast bıke!" gotın.

Gava Paşa lı hespê xwe sıwar bû İbrahim Axayê wekilxerc hate balê û lı pêşberi hespê wi çıl mih qurban kır. Hema wê gavê kertıkê piyên sê mihan bışkıvi û yek jı wan seri pêva daleqandi, dudo jı wan bêseri rabûn piya û hersê ji dı pêşiya hespê da berbı ali Xan (Evdal Xan) va lı hev şışin û çûn. Gava eskerên Wanê vê rewşê ditın, dengê wan ên Allah Allah! gıhişt esman û gotın ku "rêveçûna van mihên serjêkıri xêr e, ewliyayên Xwedê bı me ra ne." Ev rewşa han herkesi dılşa kır û hemû esker hêz bı hêz, bı hevra dı rêzeki da hatın ser hev. Bı benda,

"Mızgin xêr e, ew xema saleki seranser
Tu dıbê qey şer dıke oronê bı rım"

alay hatıbûn tekûzkırın û qewikırın; kemingeh hatıbûn sererastkırın û herkes hevdu helal dıkır, wesiyetên xwe lı hev dıkırın. Dı vê navberê da sazbendê mehterê, jı bo lêxıstına tabıl, kûdum û çengi herbi musade xwest, Paşa:

- Ne wextê wê ye, wextê duayê ye! Zû, bıla çawışên alayê werın! got. Hemû hatın.

Paşa ji:

- Bıla esker "fethi şerif" bıxwinın, yên ku nızanıbın ji bıla ayeta "iza cae" bıxwinın! temini kır. Çawışan ji, teminiyê bı cih anin.

Bı vê tewrê ra hemû esker lı beriya Rehwa çelıqi, hêdi hêdi meşiya û hemû çawış mıl bı mıl geriyan û:

- Bızanın, agahdar bıbın geli gaziyan! İro roja şerê Kerbelayê ye û yên pêşberi we dıjmınê canê we ne, Yêzidi ne. Gıli û gazınan deynın aliki. İro şerê Osmani ye, "gafil mebaş" gotın û beyta:

"Rojeki ecel tê, jiyanê jı ti dıstine
Nezani meke, çavê xwe baş veke, gıli û gazın deyne aliki"

xwendın û xelkê rakırın cengê.

Bı vi şıkli çûn. Gava parêzgehên Xan hatın xuyan Paşa, dı nav esker da lı beramberi dıjmın sê cara jı dıl navê Mıhemed da qirandın ku erd û esman lerızi. Pıştre bı deh komên bandoyê "tabıl" û "kûdum"ên eskeri hate lêxıstın ku erd û esman jı berê dıhejiya. Alem jı vê xwepêşandınê coş dıbû, çavê insan leylan dıda. Jı ber şınginiya ala û sancaxan zıravê insan dıqetiya Rehwaya lalezar jı ber dengê insan, hesp, hêstır û deveyan dıhejiya, toza reş dıgıhişt ewrê şin û bı ser eskerê Xan (Evdal Xan) da radıweşiya. Dı vê beriyê da wısa keltekelt bı esker ketıbû ku, êdi jı bo tu insanek veger ne mumkun bû. Bı vê tertibê defa cengê hate lêxıstın. Gava jı meydana şer ra qonaxa topek ma, hemû eskerên iş û serbaz wek bızınên İspir berbı cihên tayinkıri, çiyayên bı kevir hılkışiyan. Begê Melazgirê berbı çiyayê Dehdiwan, cihê Çaker Axayê wezirê E.Xan çû û xwe amade kır. Lı mılê çepê, lı ser çiyayê Avûnç keyayê Xan Ereb Xelil Axa dı keminê da bû û Begên Mervi, Karni ji bı ser wan vi hatın şandın.

Encam, peya hêj jı şevê çûn û rêz bı rêz çaraliyê bajarê Bedlisê gırtın, xebera amadebûna xwe gıhandın Paşa. Pışti vê xeberê bı şeveqê ra işaret hat dayin û jı rexê paşa topên kolomborne û balyemez, jı ali Waniyan ji topên şahi hatın avêtın.Gulleyên topan bı ser keviran da, bı ser serê wan da bariyan û peyayên Xan ên parêzgehan jı hev belawela bûn, lı nav hev qelıbin û jı nû va cihê xwe gırtın. Ew ji, jı can û dıl awazên rızgariyê bılındkırın. Eskerên me ji, bı dengê "Allah, Allah!" qiriyan û bersiva wan dan. Dı vê bazara dan û stendınê da bin lı mın çıkiya û heyran mam.

Axır çaxa ku carek dın berbı parêzgehan top hatın avêtın, hemû parêz-

gehên kevır tarûmar bûn, esker bı şûrên tazi jı cihên kambaxkıri ketın hundır û herdu ali lı nav hev qelıbin. Jı herdu aliyan bı hezaran top û tıfıng hatın avêtın û eskerê herdu aliyan dı nav agırê Nemrûd da man.

Ew dem jı roja mahşerê nişanek bû. Gava dûyê barûda reş gıhişt esman û dost û dıjmın cihên xwe kıfşkır, Çaker Axayê ku lı serê çiyayê Dehdiwan bû, dit ku eskerên Osmani jı nav parêzgehan şûr dadıweşinın û tên. Her çıqas Çaker Axa dı parêzgeha xwe da sekıni û gelek dı berxwe da ji, dı dawiyê da Begên Melazgir û Mehmûdi wi jı cihê wi derxıstın û herweha Çaker Axa berbı bajarê Bedlisa jêrin reviya.

Hemû hêzên Wanê jı paşa musade wergırtın û jı ali Newala Qesaban wek qesab ketın nav eskerên Xan û wana wısa şıkandın, xwin wek rûbaran bı ser parêzgehan da herıki, kevır jı xwinê sor bûn.

Lı vê derê Paşa, destmalek da mın û mın şand ba İbrahim Begê Mehmûdi. Dema ku ez û şeş xulamên mın gıhiştın ba Beg (İbrahim Beg), mın sılavê Paşa jê ra got û perûya Paşa dayê. Beg bı qasi cihanek şa bû.

- Efendi Beg, Paşayê mezın sılavan lı te kır û got ku, xiret ne ya mın e, bı rasti xiret a ocaxa Mehmûdiyan e. Ka ez wana bıbinım, ku jı bo dinê mubin û dewletê çawa şer dıkın. Xwedê işê wan hêsan bıke! mın got.

İbrahim Beg hanhanka jı hemû eskerên xwe ra: "Yê ku jı Xwedê û Mıhemdê xwe hez dıke bıla zırxê xwe derxe!" got û dı cih da sê hezar eskerên bı zırx, zırxên xwe derxıstın û lı ciheki avêtın ser hev. Bı qasi hezar esker lı ba zırxan hiştın û hevdu helal kırın.

Ez ecêbmayi mam û mın got ku:

- Ev çı iş e, dı meydana şereke weha da xazi jı bo cengaweriyê zırx lı xwe dıkın, vana ji rabûne lı vê derê zırxan derdıxın. Mın jı yeki pêzan pırskır "ka eslê viya çı ye?"

- Belê. Nıha vana dıkevın şereki mezın ku safi şerê gulleyan e, lê dı şerê gulleyan da zırx ne baş e. Çaxa gulleki lı merıva dıkeve, helqeyên zırxê dıkute laşê insan û eger merıva nekûje ji roj bı roj dıxe nav ciyan, lê eger zırx tune be gulle lê dıkeve û jê derbas dıbe, wê çaxê ya merıv dıde yan ji dıstine. Jı ber wê yekê wana bı vi hawê zırxên xwe derxıstın. Tu bıbine ku Mehmûdi çawa şer dıkın! got.

Mın wi tıştì dit ku, pıraniya van eskeran hespên xwe berdan û sê hezarên wan bı peyati, du hezar ji bı sıwari, bı dengê "Allah, Allah!" wek şevşevok bı zınaran va hılkışiyan û êrişi parêzgehê eskerên Xan ên bı bıryar kırın. Bêçare! Ez lı ser hespê xwe mam, jı şerına paşva nezvirim û metalmayi dı nav qewmê Mehmûdi da mam. Xwedê şahıd e ku carek hışê mın çû û çavên mın tari bûn. Paşê hışê mın hate serê mın û jı tırs û xofê xılas bûm. Çavên mın bûbûn wek tasa xwinê. Jı herdu aliyan gulle wek baran dıbariya. Çaxa mın dit hınek dıkevın, hınek radıbın û hınek ji lı erdan dırêj dıbın çıngini jı serê mın çû û ez bı xwe ji lı ser wan zınarên asê ketım xeyalan, qureti lı mın peyda bû. Peyayên ku bı şevê çûbûn ji, guh dıdan dengê topan û jı ali rojhılata Kela Bedlisê berbı parêzgehên çavkaniya Newala İskender, bı dengê "Allah" meşiyan. Sing dı sing da şer kırın û wana ji, aliyê dın jı hev belav kırın û ketın bajêr. Jı Newala Avûnç, eskerên Ercişê ketınê. Jı Newala Tekmanê, eskerên Adilcewaz ketın hundır. Jı buhura Kaniya Qesaban hemû eskerên Wanê, jı Newala Qınah Begê Mûşê û Begê Tekmanê, jı ali Newala Avûnç ji, Begê Qozcan û Pasinê ketın parêzgeh û keminan.

Bı kurti hemû esker jı çar aliyê bajarê Bedlisê, çav lı serê war taribûyi, jı parêzgehên bendkıri bı dengê "Allah Allah!" ketın hundır. Pışta xwe dan hev û wısa şûran daweşandın eskerên Xan ku, mirê felek jı viya hesûdi kır.

Ew ji (eskerên Xan), hanhanka xwe lı parêzgehê xwe yên qewi ragırtın û bı hemû qewetên xwe, .ı dılşewati şer

kırın. Yên ku jı parêzgehan derketıbûn derva ditın ku, Osmani û Wani çarali dorê gırtıne. Ew ji, dı cih da lı ciheki hatın ser hev û wek topa beraz, wek seyê har êriş kırın. Eskerên herdu aliyan bı "Allah, Allah!" ketın nava hev. Bı hezaran gulle badılhewa hatın avêtın. Dı wi şeri da jı eşira me yên Mehmûdi, hespek û merıvek şehid bûn, çıl kes ji bırindar ketın. Pıraniya wan ji, jı hespan ketın û bırindar bûn.

Ew roj cenabi heq wısa qewet û qudret da eskerên me ku, tevi ku dı parêzgehan da kevırên wek qubbeyên hemamê, newal, gaz û bı hezaran çal û mırtên bê iman hebûn ji, çavên eskerên me tıştek nedıdit û peyayan dı dereca amıran da xwe hılavêtın, sıwaran bêtırs hespan ajotın û bê hejmar seriyan fırandın. Hema wê gavê lı ali me, Celoyên peya yên Xanê Hekkariyê ditın ku eskerên Xan (Evdal Xan) xwe dı parêzgehan da radıgırın, .êyi ku mecala tıfıng-teqandınê bıdın wan bı ser zınaran da wek teyrê ebabil fıriyan û bı çaveki tari ketın parêzgehan, destbı şûrweşandınê kırın. Tu nabêji dı navbera Celoyên Hekkari û Rojgiyên (eşira Rojgi) Xan da dıjmınatiya xwinê hebûye. Qewmê Celo yên Hekkari, bı dıjmınatiya kevın vê fersendê bı kar anin û bı Waniyan ra bûn yek. Dı saetan da, dı nava parêzgehan da wısa şereki kırın ku, dı parêzgehên ali Xan da yek insan nema. Xwin wek lehi bı ser zınaran da herıki û yên ku fılıtin ji dil, şıkesti û perişan ketın. Her yek jı wan dı destê celadê bêaman da dest lı ber seri, hatın qeyd û bendkırın û vê erdê bêitibar da bı hezaran kes dı nav dest û piyan da mabûn, bırindar û bêtaqet ketıbûn. Tevi vê halê ji, çav lı eskerên me sor bûbû, serê hêsiran wet goga çevganê gêr dıkırın û seriyan radıgırtın. Hınek jê dıgotın ku, seri bargırani ye û tenezulê seriragırtınê nedıkırın, lê poz û guhên seriyan jêdıkırın û dıkırın tûrên şûr. Herweha bı barên sıvık bazdıdan da ku seriki dın ji jêkın. Bı vê hawê hın mêrxasên nûçevan û çepdest hebûn ku, bı bist guh û deh poz, yan ji bı pazde-bist poz û çıl guh derdıketın pêşberi Paşa.

Lê tıştê rasti ev e ku jı hev belav bûn, bıserketın dı destê Xwedê da ye. Dı nav eskerên Xan ên Rojgi da ji, mêrxas û qehreman hebûn. Pıştı ku bınketına wan aşkera bû, pêşewa û serokeşirên Motki, Sorpi û yên dın ên eskerên Xan (Evdal Xan) kefenên xwe avêtın stûyên xwe û bı hevalbendiya Musli Axayê Guzeldere, lı hember Celoyên me yên Hekkariyê dı nava wan zınaran da kom bo kom şıkandın. Disa jı Xaniyan çıl hêz dı nav zınaran da kom bı kom gıhiştın hev. Lı dû hev wek Mazendrani şer kırın û bı ser eskerên me da wısa gulle barandın ku, yek jı yên ku bı qasi qonaxa gulleyek nêzi wan bûn nefılıtin û wek merşık lı erdê pij bûn.

Herweha şer dıhate domandın û nêzi Kela Bedlisê esker ket parêzgeheki kambaxkırı û wê derê zeft kır. Lê çaxa ku esker kete parêzgehê, peyayên Xan dev jı wan bernedan. Şereke sing dı sing da hate kırın û dı vê navberê da jı Kela Bedlisê heft top hatın avêtın û eskerên me tarûmar bûn, bı vê hawê eskerên Xan ji dı selametê da man.

Hanhanka hemû serbaz (serbazên Osmani) lı ciheki bılınd lı hev cıviyan û ketın şêwrê:

-Bırano, çı bû, bû. Xan jı hev ket. Hemû eskerên me çûn bajê da ku talanê bıkın. Nıha eskerên Xan dı van parêzgehan da mane, mumkun e ku fenek lı me bıgerine. Hevalno, dıvê jı viya ra çareyek bê ditın, gotın û jı bo hewarê mın şandın ba Paşa.

Dı demeki pır kurt da mın xwe gıhand ba Paşa:

-Sultanê mın, Begên Kurd sılavan dıkın û nıha jı bo hewarê çend hezar esker dıxwazın, herweha mın meselê bı kurti jê ra got.

Paşa, hanhanka Yûsûf Kethûda kır serdarê sê hezar esker:

- Bıla peyayên mın bı gemê hespên xwe va kevnıkek spi wek nişan daleqının. Bıla hemû esker, herdu serê şapıkên xwe yên paşayi wek şapıka

Mıhemedi berdın, gote û ferman da. Serê eskerên Kurdıstanê bı serbendên reş gırêdayi bûn, ew bı xwe ji (eskerên Osmani), xwedi kıncên reş ên şayaq bûn û dırûvê wan bı hev dıket. Jı ber vê yekê eskerên me, dı şer da pıri caran bı nezani serê bırindar û şehidên me jêdıkırın û danin ba Paşa da ku bêne perûkırın. Axır jı bo ku weha nebe, wezirê me yê mêrxas jı bo vê rewşê tedbirek stend û hêj bı can bû.

Gava mın xebera hewarê ani, sê hezar eskerên Kurd û bı qasi sê hezar eskerên Zoraveran dı bın serdariya Yûsûf Kethûda da çûn hewara Begên Kurd (yên ku pıştgıriya Osmaniyan dıkırın). Bı çavsori çaraliyê wan parêzgehan, yên ku eskerên Xan tê da dı berxwe dıdan, gırtın û şerek wısa qewımi ku, felek lê ecêbmayi ma.

Dı dawiyê da eskerên Xan, jı ber zerpa êrişê, jı parêzgehan bı şûrên xwe yên tazi derketın der û êriş bırın ser komeki eskerên me, wana tarûmar kırın. Dı wê cihê bı kevır da eskerên Xan, bı sê awayan lı hev cıviyan û wek se şer kırın heta ku jı gazê serejêr berbı bajarê Bedlisê reviyan, gıhiştın bınya kelê û sax û selamet ketın hundırê kelê.

Bı rasti, wek Rostem şer kırın û xılas bûn. Bı kurti cıvata van eskerên bêmeaş, belav bû. Bı rasti evdên Wanê yên Osmani, dı vê meydana şer da wısa mêrxasi, mêrani û serweri kırın ku, dı nav zınaran da jı xwina eskerên Xan gol çê bûn. Tevi ku eskerên dın (eskerên Evdal Xan) hawarê ji dadıxıstın, Waniyan mecal nedıdan û serê wan jı laşê wan dıqetandın û davêtın erdan.

(Gername, cild: IV, rûp. 220 - 228)

# "EW MIN İDAM Jİ BIKIN EZ KURD IM"

Wek tê zanin Saliha Şener, dı têkoşina gırtiyên siyasi da pıştgıriyeke hêja nişan dabû, lı dıj dewleta zordest bı şêrane rabûbû û dengê xwe dabû hısandın. Dı meha Sıbata 1988'an da ji "jı bo pıştgıriya gırtiyên siyasi û jı bo zımanê Kurdi" rojek berya cejna Remezanê, lı pêşberi belediya Diyarbekırê jı bo protestokırına dewleta kolonyalist xwe şewıtandıbû, lê jı ali xelkê va hatıbû xılaskırın.

Ev dayika Kurd, dı hılbıjartına serokatiya belediya Diyarbekırê da, dı xwepêşandına SHPê da bı Kurdi axaftınekê dıke û dı axaftına xwe da bangi gel dıke da ku ew dıji zordestiya hukumeta Tırk, dıji buhayiyan rawestın û hwd.

Pışti xwepêşandınê, S.Şener tê gırtın û saleki ceza lê tê bırin. Bıryara cezakırına wê, nımûneyeke şoveni û rûreşiyê ye. Bıryar weha tê formulekırın:

"Dı 20'ê Adara çûyi da lı Diyarbekırê, dı xwepêşandına SHP'ê da sanıq Saliha Şener axaftınek kıriye, sanıq axaftına xwe jı dervayi zımanê Tırki bı zımanek dın, jêra zımanê Kurdi tê gotın, ku jı aliyê dewletê va nayê naskırın, kıriye. Bı vi awayi lı gor qanûnên hılbıjartınê û muxalefetiya qanûna 2932'an, lı gor delilên ku hatıne berevkırın û iqrara wê ew sûcdar e. Jı ber vê yekê dıvê sûcdar, lı gor muxalefetiya herdû qanûnan jı bo saleki bête cezakırın...."

Dayika jêhati, ifada xwe ya dadgehê ji bı riya wergervan (tercuman) bı Kurdi pêşkêş dıke û dı axaftına xwe da weha dıbêje:

"Ez gundi me. Lı gundê me her kes bı Kurdi xeber dıda. Ez dı 15 saliya xwe da hatım zewıcandın. Mın rûyê dıbıstanê qet nediye. Ez ê weki dın bı kijan zımani xeberdım? Dı mıtingê da mebûsê Diyarbekırê Fuat Atalay, bı mılê mın gırt û derxıst ser kursiyê. Jı ber ku mın bı Tırki nızanıbû, ez mecbûrê axaftına Kurdi bûm. Cezayê ku lı mın hatiye bırin, qebûl nakım. Ew mın idam ji bıkın ez KURD ım. Ne ez ne ji dewlet dıkare vê rastiyê bıguhêre..."

Awûqatê Erdinç Uzunoğlu, S. Şener weha dıparêze: "Muwekila mın jı ber axaftına xwe ya Kurdi tê dadkırın, lê wê dı dadgehê da ji ifada xwe bı Kurdi û bı riya tercuman da. Jı ber vê yekê bıryarek weha hım bı xwe ra dıkeve hevrıkiyê, hım ji peymanên navnetewi dıxe bın lıngan. Kurdi bı serê xwe zımanek e. Ev, rastiyeke sosyolojik e û merıv nıkare inkar bıke."

Dı pêncsaliya mırına

# CİGERXWİN da

## ÇEND GOTIN LI SER SALÊN Wİ YÊN LI DERVAYİ WELAT

Dı ser mırına şair û mamostayê mezın, seydayê Cigerxwin ra pênc sal derbasbûn. Çı lı welat, çı ji lı dervayi welat, jı bo biranina wi, cıvinên mezın hatın amadekırın.

Em bı rêz û rûmeteke bılınd mamostayê mezın bı birtinın. Lı ser jiyan, têkoşin û xebata Cigerxwin çıqas pır gotın û pesın bên gotın lı ci ye. Jı bo ku em bıkarıbın vi mırovê mezın bêtır nas bıkın û fehım bıkın, dıvê em jı gelek aliyan va bala xwe bıdın ser jiyana wi, têkoşin û berhemên wi û derbari wi da lêkolinan çêbıkın. Ronakbirên welatparêz vi tışti dıkın û wê hina ji bıkın.

Em dı pêncsaliya mırına wi da dıxwazın çend gotınan bêjın lı ser 4-5 salên wi yên dawiyê, ku lı dervayi welat derbaskır. Dema em van çend salên dawiya jiyana Cigerxwin raçav bıkın, hıngê emê şervaneki azadiya gelê Kurd, militaneki 80 sali, şaireki "ciger bı xwin", birewereki dılnızım, rêwiyeki riya dıjwar, lê geleki bı hêvi û aram, piremêreki gotınxweş, kaleki Kurd ku wek pırtûkxaneke çanda Kurdi, zıman û edebiyata Kurdi, dirok û serpêhatiyên cıvata Kurd a sedsala bistan bû, bıbinın.


Pır mıxabın ku bıli çend kurtefilmên video, belgeyên ku wi bı deng û lıvin bıdın nişandan tunene dı destê me da. Ev kêmasiyek e ji bo me. Û bêşansiyek e jı bo kesên ku ew neditıne û pêra qıse nekırıne...

Dıjmınên gelê Kurd, nedıhiştın ku Cigerxwin dı welat da, bı serbesti berhemên xwe derxe û belavke. Bı dehan pırtûkên wi, ku bı keda salan hatıbûn amadekırın, lı benda çapkırınê bûn. Bı hiviya çapkırına pırtûkên xwe, dı sala 1979'an da jı welat derket çû lı Swêdê ciwarbû. Bê rıza dılê xwe, bêçare ew jı gelê xwe, jı welatê xwe qetiyabû.

Kesên ku lı taxa Tenstayê (Stockholm) çûne serdana wi, wê qet jı bir nekın ku, Cigerxwin çawan jı ciyê xwe, an jı ser daktiloya xwe radıbû hetani ber şêmika derva dıhate pêşiya mêvanên xwe. Bı emır mezınbûna mêvan, xorti, jınti nedıgot; lı hember herkesi dılnızım bû mamosta Cigerxwin.

Wi, xebata lı dervayi welat, wek eniyeke şerê azadiya gelê Kurd dıdit. Lı dervayi welat, lı pêşiya welathız û şoreşgerên Kurd, yek jı wezife û pêwistiyên sereke ew bû ku, dengê gelê Kurd bı dınyayê bıdın bıhistın. Jı têkoşina gelê Kurd ra dostan peyda bıkın. Dı van xebatan da seydayê Cigerxwin bı xwe ji vala nedısekıni. Dı 80 saliya xwe da ji, heta jê dıhat, dı meş û mitingan da beşdar dıbû. Bı keç û xortan ra dıçû lı pêşiya konsolosxanên dewletên kolonyalist yên ku Kurdıstan parçe û bındest kırıne, dengê xwe bılınd dıkır.

Belê wi karê nıvisandınê lı Swêd ji dımeşand. Lê wextê wi jı bo xebatên dın ji hebû... Wi pışt dıda xebata rêxıstıni, lı gor wi geleki bındest bê rêxıstın, bê yekiti nıkarıbû bıgije azadiyê. Bona vê yekê ji, lı kêderê cıvin û xebatên welatparêzan hebûya Cigerxwin bı dılşayi têda beşdar dıbû. Piştgıri dıda xebata tevger, kom, komele û federasyonên



*Dı komcina komela me, Komela Karkerên Kurdistan da serokatiya diwanê dıke. sal 1981.*




*Lı Stockholmê dı cıvineki da ,dıgel Kemal Burkay*

Kurdi. Ew dıçû lı gelek welatên Ewrûpayê beşdari şahiyên Newrozê dıbû. Dıçû lı Elmanya Federal dı komcıvinên KOMKARê da beşdar dıbû; dı komelan da bı karker û mıhacırên Kurd ra gotûbêj dıkır. Lı Parisê dı avakırna Enstituya Kurdi da beşdar dıbû. Lı Stockholmê herweha dı komcıvin, şahi û mitingan da xuya dıbû.


Heta roja dawiyê ji, dılê seydayê mezın bı xiret û daxwaza xebatê, bı hivi û baweriya Kurdıstaneke azad lêdıxist. Gelê Kurd, ev lawê xwe yê mezın dı roja 22.10.1984'an da lı welatê xerib wında kır, lê bı civineke nebinayi mezın, cenazê wi dı axa Kurdıstanê da veşart.



*Lı Elmanya Federal, dı komeleki da bı karker û mıhacırên Kurd ra*



*Lı Elmanya Federal dı şevekê Newrozê da*



*Lı Norveçê dı şeveke Newrozê da qıse dıke*



*Cigerxwin dı merasıma cenazê Mustafa Budak (Apê Selim da qıse dıke*


# Turba mamosta **Cigerxwin**

## Dı hewşa mala wi da tê avkırın

Derbari turba mamosta Cigerxwin da, me jı kurê wi Azad Cigerxwin pırs kır.

_ Kek Azad, em dızanın ku karê çêkırına turba seydayê Cigerxwin berdewam dıke. Gelo tu dıkari bı çend gotınan behs bıki?

_ Çêkırına turba Cigerxwin jı sala 1985'a destpêkır û hina neqediyaye. Muhendızeki Kurd ev kara hıldaye ser mılê xwe, ku proja wê jı aliyê wi va tê meşandın. Hıneki hêdi meşiya jı ber ku heval dıxwazın materiyaleki baş bı kar binın. Hım peydakırına materiyal (çimento û mermer) hım ji bıhabûna wê sedemê dereng me-şandına çêkırına turbê ye.



_ Lı gor baweriya mın mezelê seyda basit be çêtır e. Jı ber ku mırov nızane kengê, kijan rejim rojeki bı boldizeran hılşine. Garantiya vê tune.Ji xwe ew nêziki xetê ye, hukumeta Tırkiyê ji acız e ku xelk jı Kurdıstana Tırkiyê ditına turba Cigerxwin. Jı çarali Kurdıstanê, jı welatên dın, Kurdên Yekitiya Sovyetê tên ser mezelê Cigerxwin. Dı Newrozan da gel lı ser turba wi dıcıvın. Neyarên gelê Kurd jı vê yekê acız dıbın.

## Lı Danimarkayê Cara Pêşin

# "HEFTEYA ÇANDİ YA KURD"

Lı Danimarkayê hejmara Kurdan nêzi deh hezari ye. Pıraniya wan, Kurdên Anadolê ne û jı ber sedemên abori hatıne vır. Pışti sala l980, gelek penaberên siyasi ji lı vê derê bı cih bûn. İnsanên me ji, wek biyaniyên dın bı baweriya ku rojki zûtır bızvırın welatê xwe derketın dervayi welat. Lê mıxabın hesabê malê û çarsiyê wek hev derneket û sal bı sal jiyana welatên dereke lı wan rûnışt. Bı vê jiyana nû ra gelek pırsgırêk ji ketıne ser hev û çareseri dıxwazın.

Komela me KOMKAR-Danmarkayê jı bo çarelêkırına pırsgırêkên insanên me, jı bo mafên wan ên demokratik (ku karkerê neteweyên dın xwedi mafên radiyo, televizyon, perwerdegariya zıman, çandi û hwd. ın) çar sal berê hate damezrandın. Dı vê kurtedemê da Komela me, bı gelek awayan karkerên Kurd temsil kır, pırsgırêkên wan lı gelek platformên cûda ani zıman û pêşniyar kır.

Jı bo ku penaberên Kurd ji, wek biyaniyên dın bıkarıbın mafên xwe yên demokratik bı kar binın, jı bo ku zulm û zordariya ser gelê me aşkera bıkın, me dı navbera 6 - 11'ê Çıriya Paşin da "hefteyeke Çandi" çêkır.

Dı programa "Hefte"yê da gelek siyasetvan, nıviskar, sendikavan, profesor, ewûqat, sosyolog û çandnasên Danimarkayi ên navdar beşdar bûn. Jı bıli vana jı texminên me gelek betır Danimarkayi beşdar bûn û pıştgıri nişan dan. Ev hefta han, jı bo gelek xwendekarên Danimarkayi ên universitê bû babeta lêgerin û têzhazırkırınê.

Eger em bı kurti babet û beşdarên sereke yên "Hefta Çandi ya Kurd" bıdın xuyan, lı gor vê rêzkırınê derbas bû:

**Roja Yekem:**

Babet: "Tarixa Kurdıstan, çand û jiyana wi."

Rawekar: Dr. Rehber Rêzan.

Dr. Rehber Rêzan dı axaftına xwe da lı ser tarixa Kurdistanê, jiyana gelê Kurd, dewlemendiya çanda wan û pırsgırêkên wan sekıni, bersiva pırsên mêvanan da.

**Roja Duwem:**

Babet: "Penaberên Kurd ên Danimarkayê, pırsgırêkên wan ên zıman, perwerdegari û entegrasyon."

Rawekar: Berpırsiyarê Koma Xebatê Ya Lı Ser Mafên Zimani Ya Navnetewi Prof. Robert Philipson, Serokê Komisyona Cıvatên Pırzımani ya Navnetewi Dr. Tove Skutnabb-Kangas û jı Muduriyeta Kar û Barên Dıbıstani ya Belediya Kopenhagê Tom Ahlberg.

Dr. Tove û Prof. Philipson lı ser gıringiya perwerdegariya zımanê zıkmaki û perwerdekırına zarokên Kurd sekının, jı hın welatên dın nımûne nişan dan. Van pısporan, bal kışandın ser fen û zordestiyên konsolosxana Tırk û bêdengiya hukumeta Danimarkayê lı hember kıryarên konsolosxanê.

Tom Ahlberg lı ser perwerdegariya zarokên biyani sekıni û da xuyan ku, wê dı dıbıstanan da sistemeke nû bête bı cihkırın, wê zarok lı gor paşkoka xwe ya netewi, dı dıbıstanan da bêne bı cihkırın û wê zarokên Kurd ji, vi mafê han bı kar binın.

Kirsten Just Jeppesen lı ser entegrebûna cıwanên Kurd sekıni, rexne lı hukumeta Danimarkayê kır û daxwaz kır da ku Kurd dı istatistikan da, dı kar û barên fermi da bı huwiyeta Kurditi bên qeydkırın.


**Roja Sêem:**

Babet: "Nıjadperesti û dıjmınahiya biyaniyan; penaberên Kurd ên Tırkiyê û Danimarkayê."

Rawekar: Sosyolog Christian Horst, Awûqat Claus Bergsöe, Parlamenterê Partiya Gel a Sosyalist Pelle Voigt, Parlamenterê Partiya Sosyal Demoqrat Poul Qvist Jörgensen.

Christian Horst bı gışti lı ser analiza nijadperesti û paşkoka wi yê diroki sekıni û bal kışand ser gelê Kurd ku çawa jı mafên xwe yên netewi bêpar ın. Pêra bal kışand ser zordestiyên nıjadperesti yên lı ser gelê Kurd û jı bo çareseriya vê pırsê da xuyan ku, "dıvê gelê Kurd bıgıhije mafên xwe yên netewi û pêwist e ku lı Danimarkayê ji, bı zımanê Kurdi perwerdegari hebe."

Parlamenter Pelle Voigt, ku dı pıştgıriya navnetewi da dosteki me yê hêja ye, lı ser pırsgırêkên gelê Kurd û penaberên Kurd sekıni, gıringiya cıvin û konferansên netewi jı bo gelê Kurd da xuyan û dı vi wari da Konferansa Bremenê wek nımûne nişan da.



Parlamenter Poul Qvist Jörgensen , wek nûnereki İskandinavya, gera xwe ya Tırkiyê û rewşa penaberên Kurdên Iraqê rawe kır. Lı ser kampên penaberan agahdari da û nebaşiya hukumeta Tırk da xuyan. Jı bıli vana bal kışand ser neheqi û zordestiya hukumeta Tırk a lı ser gelê Kurd û wek nımûne ji, mêvandariya xwe ya lı Ruhayê nişan da ku, lı otêlê cihaza guhdarikırınê hatiye bı cihkırın û jı ber vê yekê nıkarıbûne bı Kurdeki ra bıaxıfın.



*Dosteki gelê me Pelle Voigt*

Awûqat Claus ji, bal kışand ser rewşa penaberên Kurd ên Danimarkayê, lı siyaseta hukumeta Danimarkayê rexne gırt û sedemên nedana heqê rûnıştınê weha da xuyan: "Tırkiye û Danikarka endamên NATO'yê ne. Wek tê zanin dı navbera polêsên Elman û Tırkan da karbıdesti heye û şıka mın ew e ku, dı navbera polêsên Danimarka û Tırkiyê da ji ev kar/bıdesti heye. Jı ber vê yekê hukumeta Danimarkayê bı zanebûn, mafê rûnıştınê nade penaberên Kurd."

**Roja Çarem:**

Babet: "Jı bo karkerên Kurd perwerdegariya meslegi; qanûna nû ya betaliyê."

Rawekar: Jı KOMKAR'ê hevalek û jı Muduriyeta Kar û Bar Anders Jestrup, jı Federasyona Komelên Biyaniyan Jannis Gavalias.

Bı gıştì lı ser parastına biyaniyan, perwerdekırına meslegi û çareseriya betaliyê hate sekınandın. Jı bo parastına mafên biyaniyan, derxıstına qanûnan hate pêşniyarkırın.

**Roja Pêncem:**

Destkariyên(tıştên ku bı destan hatıne çêkırın wek gore, lepık, xaliçe û hwd.) Kurdi hatın raxıstın

Dı dawiya hefteyê da ji, b navê **"Şeva Kurdıstan"** şeveke çandi hate çêkırın. Dı şevê da dora 2000 kes beşdar bûn û bı sedan kes bı listıka govendê kurdi coş bûn.

Dı programa şevê da komên folklorê yên mezın û zarokan ên komela me, koma folklora Yewnani bı listıkên xwe şahiya temaşevanan bılınd kırın û rengeki cihê dan şevê.

Dı gel hozanên hêja **Şıvan û Gulistan, Ferhad Baban, Evdoyê Weso, Koma Xerib**, bı stranên xwe yên folklorik û şoreşgeri xelk anin coşê, şahi gıhişt hedê xwe.

Dı şevê da çend mêvanên naskıri ji hebûn. Yek jı wan Parlamenterê hêja ya Partiya Gel a Sosyalist Pelle VOİGT bû ku, dı şevê da axaftınek kır û jı bo gelê Kurd pıştgıriya xwe nişan da.

Dı nav mêvanên şevê da Sekreterê Gıştì yê Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê Kemal BURKAY ji hebû. K. Burkay, bı axaftına xwe ya Kurdi bala temaşevanan kışand ku, axaftına wi pır caran bı çepıkan hate bırin. Burkay dı axaftına xwe da lı ser qimeta kar û xebata çandi sekıni û weha got: " Kar û xebata çandi ji beşek e jı têkoşina gel bo azadi û rızgariyê. Em bı karanin û pêşvebırına zımanê xwe, bı kılam û govendên xwe jı dost û dıjmın ra nişan dıdın ku em hene, diroka me heye, zımanê me heye, çanda me heye." Burkay her weha ji, bı kurti behsa tevgera gelê Kurd û got: " **Tevgera gelê me iro jı neqebeke teng derbas dıbe. êrişên dıjmınan, qırkırına Kurdan, nefikırın, zulm û teda lı ser gelê me gıran e. Lê tışteki dın heye, gel iro jı her wexti zêtır hışyar e, rabûye ser piyan û bo heq û azadiyên xwe bı mêrani şer dıke. Dı van salên dawi da, dı navbera hêzên welatparêz da pêwendiyên baş xurt dıbın, dan û stendın û hevkari pêşva dıçe. Tu hêzek nıkare geleki wek me bı 25 milyon nufûs û têkoşer bındest bıhêle. Cara pêşin e ku lı dınyayê bo Kurdan ji deng û pıştgıri bılınd dıbe, wê hin ji zêtır bılınd be. Em bı xurti bawer ın ku, bo gel û welatê me ji rojên azadiyê ne dûr ın.**"

Herweha "Hefte" û şeva me bı serfırazi derbas bûn, endamên KOMKAR'ê xebateke pır hêja nişan dan û em xwe jı xebatên hin baştır ra amade dıkın.

Bı sılavên dostani

JİYAN - Danimarka

# EVİNA DIL, EVİNA WELAT...

Dı Serpêhatiyê da, bûyer, navên mêrxasan û navên ciyan gışk rast ın.

NEWROZ/ Kurdıstana İranê

Ê var bû roj dereng bû. Dayika Evdırehman, Porê lı ber kuçık rawestıbû, hızır dıkır bo şivê çı çêke. Jı nışkêve rabû bı pelyezkê xweliya nav kuçık têkveda. Çend pelek dı nav kuçık da mabûn, hina venemırıbûn. Bı lez çend qırşık û bınıkên qetarokên hışk danine ser wan pelan û dest bı pıfkırınê kır. Dûkeleke tûj û reş jı kuçıkê wê bılınd dıbû. Çavên wê jı dûkelê sor dıbûn û rondık jê dıherıkin, dı ser rûyê wê ra dılop dılop dıbarin. Pıştı ku alaveki beri dûkelê da agır baş pêket. Wê du- sê darên nivşewıti dani ser agır û kuçıkê xwe geş kır. Heta nivi av kıre beroşê û dani ser agırê kuçık.

Porê, bı lez çû jor, lı xani dı ser kulinê de rahıştе tılisê savar, hınek berda nav berwanka (mêzer) xwe ani lı derve valayi amaneki kır û dı ber xwe de ji dıgot:

_ Mala Temır jı bo me tûreki nan tıji murtoxe, xêra bavê xwe hınartıne, ezê hema savarê xwe lênım, hındek pivazên me ji hene... Sosın û Mıhemed wê têr bıxwın û heke mêhvanek ji bê, têra wan ji heye. U hıtani sıbehê ji Xudê kerim e.

Sosına keçıka wan ji cerê avê lı ser mıla, jı kaniyê dıhat. Çavê Porê bı keça wê ket û rast rabû jı pêve û çû pêşiya wê, da ku harikariya wê bıke.



_ Dayê gori, tu dı bın ewi cerkê avê da mıri, baş e ma mın negotıbû te bı cerkê bıçûk avê bıkêşe?..

Pıştı ku Porê cer jı ser mılê keçıka xwe Sosınê ani xwarê, jê ra got:

_ Tu hêjta bıçûk i, berê xwe nede Nêrgızê û kıçên gundi, zehmetê nede ber xwe dayê gori te.

_ Na dadê kıçık yariyên xwe bı mın dıken, wextê ku ez cerê mezın nabıme avê.

Porê eniya wê ramûsa û herdu destên wê kıre nav destên xwe û gıvaştın. Wê ew hêdika paşda bıre nık diwarê xani û lı ser teht û kepenê şıvan rûnıştın. Serê sosınê

dani ser çokên xwe û got:

_ Erê Sosın kanê bo mın bêje, evro keçıkan lı ser kahniyê çı dıaxıvtın?

_ Dadê xweziya duhunê, evro jı duhunê geleki xırabtır bû. Evro dı nav hemiyan da qıseyên Nêrgızê geleki bala mın kêşa.

_ Çı dıgot Nêrgızê dayê gori?

_ Dadê ma çı nedıgot... ez jı kahniyê vedıgeram, mın dit Nêrgız lı ser berê (kevır), lı kêleka rê rûnıştıbû bihna xwe vedıda. Wextê ku ez ditım, axineke kûr jı nav dıl û hınavên xwe kêşa, pır xemgin bû. Her çavên wê lı mın bû. Ew rengê geş û sor lı rûyê wê nemabû, zer û pet bûbû. Herweki mırov bêje dı dılê wê da xwazi û hêviyên serjêkıri hene, nezani çi bıketın, jı kê ra derd û kulên dılê xwe bêjitın. Ez rawestam, hêdi çûme nık. Geleki dılê mın pêve ma. Mın bı tenahi jê pırsi: " Nêrgız tu bo çi hınde bı xem û kovan i, çı qewımiye?". Ew jı cıhê xwe rabû ser piya û cerê mın jı ser mılê mın ani xwarê bırekê behra dılê xwe vede, em dı gel yek bıçın.

Mın gotê: "Nêrgız, te bo mın negot kanê te xêr e, rengê te pêt û zer bûye, ma tu nesax i?". "Erê Sosın hûn jı Evdırehmani çı dızanın?" bı zelûli jı mın pırsi. "Ew nıha lı kiderê ye, çı dıkey û çawa ye?".

Mın ji gotê:

"Baş e bo çi te hetani evroke qet jı mın nepırsiye, evro tu çıma pırsa kekê mın dıkey?. An tıştek bı serê bırakê mın hatiye?!"

Nêrgızê, bı şermini ve û hêdi got: "Ne mala te Xudê nekıt, işellah bê bela ye". "Merema mın eve ye, mın got ez bızanım, kanê wi lı wêderê dılê xwe bo keseki dın nevekıriye, kanê ew dê kengê bête cem me.."

Ez jı merema Nêrgızê halebûm. Mın zani, jı ber hındê mın ji bersıva wê da û gotê:

"Nêrgız ma ne tu û hemi gundi dızanın ku, eve serê şeş sala ye bırakê mın Evdırehman pêşmerge ye û lı serê çiya ye. Ez hemi şeva sılav û jindariya bırakê xwe jı deng û bahsên şer û agırê dı ser pasdar û cehşan da dıbarinın dızanım. Kekê mın wextê çoy bo pêşmergayetiyê sond xwariye dı wê rêkê da venegerıtın, bı êxsiri neête gundi. Ca vêca eger tu lı hêviya wi bımini ku ew bête gund û wek herkesi rûnıtın, her nıhe ve bêhêvi be jı kekêmın. Ew naêtın."

"Ez naxwazım ewa xwe teslim bıke, ew her kêrhatiyê navê xwe ye" Nêrgızê got.

"Mın jê ra got "Lê ema par nameyeke wi gıhiştıbû me, heta hıngê ji kekê mın çu jın bo xwe neanibûn."

" De rabe em hêdi hêdi herın Sosın, dıreng e. Ew gotınên mın û te ji bıla her lı vêderê bimının, bereki dane ser". Mın got "Arxayın be Nêrgız, ez geleki hej te dıkım. Kanê evi cerê mın dane ser mılê mın, em bıçın" . Em herdu hêdi hêdi berbı malan ve meşiyan.

_ Lê belê... dadê, ewê her dıgot ax û berê xwe dıda Şêx Bazit û Kotol û her dıgot: "Ax feleka bêbext, çıma rewşa me weha ye?... Xweziyên me her lı ser awırên bılınd, dı ser serê çiyan re ditır ın, sılavê ji lı me naketın. Evdırehman ehda Xwedê lı ser ruha mın bıtın, ez an bo te me, an ji bo evê axê me."

Mın gotê,

"Ma tu dê heri ser çiya û bıbey pêşmerge?"

Nêrgız vecınıqi û got:

"Çı, te çı got!?"

"Mın got tu dıxwazi bıçiye çiya û bıbıye pêşmerge?"

"Ax Sosın, tu nızani agırê evinê berbûye canê mın, ez dımırım, ax ax derdê mın gıran e xûşkê."

Serê Sosınê lı ser çoka dayika wê bû. Wextê Sosınê qıseyên xwe xılaskır, dayika wê destên xwe dani ser serê wê û got:

_ Ax kıça mın Sosına eziz, deng neke, bese bırinên dılê dayika xwe ya porbır derneke, û çavên dayika te zuha ne, carek dın ji tıji rondık û xûn neke. Ma tu nızani Nêrgızê û bırakê te, her lı bıçûkati ve dılê xwe dabûne hev. Bêhnekê bê yek (bê hev) nedıbûn. Lê qıjloka jina dıjwar û jordest, ew aşûq maşûqana jı hev dûrêxıstın û çiyayên mezın êxıstıne navbera wana û gemiya evina wana, dı nava behra rondıkê wan da bê gemivan hêla. Dı nav pêlên jina dıjwar û gıran da... ax, ax feleka bextreşê! Çıma em her wısa dıkevıne bın qehır û zorê...

Sosınê serê xwe rakır, dit ku du rondık hêdi hêdi jı rû û sûretê dayika wê têne xwarê. Hêdika rahişte destê diya xwe, gıvaşt û dani ser rûyê xwe û got:

_ Dadê tu bı Xudê key, kanê bo mın bêje, kekê mın wê kengê bêtın? Kengê ezê henê lı destê xwe bıdım û govend û dilanê jı bırakê xwe ra germ bıkım. Ha dadê, te çı got, kengê wê bêtın?

Rondıkên çavê dayika Evdırehman pırtır bûn vê carê. Bı lewendiyê kırasê xwe çavên xwe jı rondıkan zuha kır û gote Sosınê:

_ Kıça mın ez rebena Xudê çu zanım wê kengê bêtın. Hıta em Kurdıstanê rızgar nekın û mıllet azad nebitın, ew naêtın. Ewi rêka xalên xwe daye ber xwe. Sê (3) xalêt te dı vê rêkê da şehid bûn. Xudê dızane kanê her nıhe maye an nemaye. Ev serê salekê ye çu xeber û saloqê Edoyê mın negıhiştiye destê me...

Porê rabû, çavên şıl û xemgin careke dın zuha kır û çû hawara beroşa xwe. Av dıkeliya, dı ser beroşê ra kel dıavêt. Porê, bı lez savarê xwe şûşt û berda nav beroşê û hındek xoy pê werkır û bı heska dar beroş têkveda û qapaxa wê dani ser. Wê agırê bın kuçıkê ji kêm kır, da ku rızqê xwe nesoje.

_ Kıça mın Sosın, kanê wan pivazana bıhıncine, em bı savarê ra bıxwın. Porê got.

Çaydan tıji av kır û dani ser kuçık, dûra teşiya xwe gırt, dest bı hûnandına risê gore û lepıkên Evdırehman kır. Geleki nekêşa çû gırar jı nav pela rakır û hındek rûnê sorkıri pêdakır û dani kêleka kuçık, bo ku sar nebe. Dengê kela pêşin a çaydanê dıhat. Hılm , pıxur jı lûleyê derdıket. Car caran dengê qêrin û hawara bıreke zarokan dıhat, ku dı ber derê wan ra dıbezin, bı hev henek û yari dıkırın.

Hêdi hêdi roj dıçû ava. Siya çiyayê Kotol xwe berdabû ser gundê Gubetê. Gupıka çiyayê Şêx-Bazid jı tirêjên rojê sor û zer bûbû, mırov dıgot qey serê pênıviseke zêrrin e ku dı nav hubra ava zêrrin da kırıne.

_ Sosınê! wo Sosınê!

_ Belê dadê çı dıbêji?

_ Kıça mın hındek çay bavêje nav çaydanê û daine nav pelan. Babê te nıhe geleki têhni ye, bıla pêş nani da vexwetın.

_ Baş e dadê ezê nıhe bêm.

_ Eve babê te ji hat kıça mın, ezê herım sıfrê raxım.

Porê sıfra nan raxıst, savar, nan û çend seri pivazên spikıri û aveke tazi dani ser sıfrê.

_ Evara te baş kıça mın Sosın.

_ Bê bela bi babo, mandi nebi.

Mam Mıhemed bı wi şalê kevn û pinekıri, dıgel kıraseki gıncıri, enişk û berstû lêdıriyayi kete hundur. Sılav lı kevaniya xwe da û pêlavên xwe yên pahin lê qelışi, jı piyê xwe kır û derbasi jorê bû.

Porê bı lez bang lı keça xwe kır:

_ Sosın! Sosın, dayê çayekê jı babê xwe ra biêne.

_ Baş e dadê, eve ez dıênım. Sosınê lı diya xwe vegerand.

_ Te çı çêkıriye, ez geleki bırsi me evda Xudê? Mıhemed pırsi.

_ Ma tu nabêni me eve lênaye. Ma çı heye?

Sosınê çay ani lı ber bavê xwe dani û lı hember wi rûnışt.

_ Sosın kıça mın, kanê bo babê xwe bêje"Dengê Kurdıstanê" çı got? Çu pêşmerge şehid nebûne?

_ Wıla babo mın nivro vekır, lê xışe-xışê nehıla ez bı başi guhê xwe bıdımê, lê sê pêşmerge şehid bûne.

_ Te got çı, lı kiderê negot?

_ Belê got, lê mın nızani, kiderê.

_ Baş e kıça mın, ez spêdê guh lêbım, Xudê ewana sılamet bıket. Ma eger ewana lı pışt me nebın, hûn dızanın ev pastar û cehşane wê çı bı serê me binın. Wıllahi wê weki berê me bışêlinın, talan bıkın û namûs û şerefê jı me ra nahêlın. Destê Xudê û pêxembera dı ser serê ewana ra be.

Dayika Evdırehman û xûşka wi pır xemgin bûbûn. Nıkarıbûn nanê xwe bıxwın.

Sosınê got:

_ Eve salek e me nızani kekê mın lı kire ye û çı dıket?

Mam Mıhemed ji got:

_ Kıça mın ew pêşmerge ye, her rojekê lı cıhekê ye. Me ew fıdayi rêka Kurd û Kurdıstanê kıriye. Ev hone nabe, tu ji weki dayka xwe hemi roja jı bırê xwe ra bıgıri...

_ Babo xwezi ez kur bama, ezê hıngê çûbama nık kekê xwe.

_ Erê wıllah kıça mın tu kur bayi mın tu hınartıbayi. Dê werın em nanê xwe bıxwın. Disanê ev roj sê Evdırehmanên me, sê bırayên me şehid bûne. Dıjmın bê şer jı welat dernakeve, hıta xûnê nerêjın dara azadi şin nabıtın.

Şiv dıxwarın, êdi dınya baş tari bıbû. Şêrên gel jı çiyan dadıketıne nav gunda. Dengê seyên gund jı taxa Nışiv bılınd dıbû. Diyar bû ku dıçûne mırovan. Mam Mıhemed got:

_ Sosın kıça mın heçku hezar kes bêjıte mın ewe pêşmerge ne, dema wana ye.

Sosınê jı kêyfa nan nexwar û got "Kekê mın nebitın?"

_ Kıçê Sosın eger te nas nekır, deri jı wan ra veneke, neku caş bın kıça mın. Diya wê got.

_ Dadê ma tu bêji ez ferqa cehş û pêşmerga nızanım...

Xêleki nekêşa, dengê Sosınê bı bılındi hat:

_ Dadê ew ın! Bapır û Tacıdin ketın hundur û pêlavın xwe derdıxıstın, lı gel

Sosınê dıaxıvtın. Tacdin dıgote Bapır:

_ Kurbabo Sosın çend mezın bûye. Hema bûye jıneki oha.

Sosınê şerm dıkır. Ken lı ser lêva xêrhatına wan dıkır. Mam mıhemed û dayika Evdırehman jı ber wan va hatın û dıgel xêrhatıneke germ ew bırıne jor û rûnıştın. Sosınê xwe negırt, pırsa bırayê xwe kır.

_ Kanê kekê mın? Bo hewe neani?

Bapır bersıv dayê:

_ Em û ew heyvekê beri nıhe dıgel hev bûn. Nameyek da mın, ew ji nıhe tên, evro, sıbehi wê peydabıbın. Geleki baş e, sılavên wi bo hewe hene.

Tacıdin rabû ku destê xwe bışo. Sosınê bı lez av û sabûn jê ra ani. Lı berderi av lı destê Tacıdin kır. Tacıdin gotê:

_ Sosın tu geleki delal i dızani, mın tu nas nekıri pêşiyê, memıkên te geleki mezın bûyıne... Sosınê jı şerma serê xwe dıçemand û av her dırıjiya, û wê bı ken û nazdari got:

_ Kanê kengê ez mezın bûme, delala çı me. Mala te...

Mam Mıhemed bang lı Sosınê kır:

_ Dê Sosın kıça mın, sıfrê bine nêziki Tacıdin û Bapır , nıhe geleki bırsi ne, têhni ne. Kanê ewıli du çay bo wana berde.

_ Baş e babo.

Sıfre danin. Hındek savar, nan, çend pivaz û ava sar... Mam Mıhemed got:

_ Lı me bıborın eve rısqê hewe nebû, lê em çı bıkın, bra...

_ Ew çı gotın ın, Mam Mıhemed. Ewıl em mêhvan ninın û eve ji jı serê me zêde ye. Destê we neêşe û Xudê avake. Roj hıtani êvari em nanê hışk pê avê ter dıkın û dıxwın, ev savara nabe para kesê.

Pıştı ku nanê xwe xwarın, paşda vekışiyan û Sosınê bı lez jı ber wana rakır. Tacıdin destê xwe dırêji paşıla xwe kır û nameyek bıçûk, jı xuh û qırêjê reşbûyi, derani, û dırêji destê Mam Mıhemed kır.

_ Keremke Mam Mıhemed eve nama Evdırehmani ye. Mam Mıhemed name wergır û got:

_ Sosın kıça mın were çay bo me bine û evê nama kekê xwe ji me ra bıxwine. Sosınê bı lez çay ani û lı ber mêhvana dani û name jı destê bavê xwe wergırt. Kaxız derxıst û dest bı xwendınê kır:

"Babo û dayê çawan ın, baş ın. Xûşka mın Sosın çawan e, baş e? Hiviya mın eve ye hûn her sax û sılamet bın. Eve salek mın çû , name jı wera nenıvisiye, hal û rewşa we nepırsiye. Lı mın bıborın. Ezê heyva gelavêjê bıgıhme xızmeta hewe. Hıngê emê gelektır bo xwe bıaxıvın. Ez destê te û dayıka xwe maçi dıkem û herdu çavên Sosınê maçi dıkem û sılavên xwe bo hemi cinar û heval û hogıran dıhınerım.

Dı nav şahi û xweşiyê da bıminın.
Kurê hewe Evdırehman.

Dayik û bab û xûşka Evdırehman geleki şadıbûn. Wan wısa dızanin Evdırehman hema lı hember wana rûnıştiye û dıgel wana dıaxıve.

Sosın bı lez, bı haceta şûştına iskanên çayê, xwe gihande hewşa berderê mala Nêrgızê. Nêrgız lı ber deri sekınıbû, dılkutê ew gırtıbû. Jı ber ku dızanıbû pêşmerge hatıne nav gund û çûne mala Sosınê, dıbe ku Evdırehman be ji. Wextê ku dit Sosın tê nık wê, pır bı dıleki şa lê bı mereqe mezın jê pırs kır:

_ Kekê te hatiye?

_ Ne, Tacıdin û Bapir ın.

_ Baş kekê te lı kiderê ye, bo nehatiye?

_ Ewi nameyek bo me hınartiye, wê çend rojekê dınê bête sera (serdan, zeyaret) me.

_ Kanê nama wi lı ba te ye?

_ Erê dı paxıla mın daye.

_ De baş e, kanê bo mın bıxwine!

_ Axır mala dı vê tariyê de kê dışêtın nıvisekê bıxwinıtın. Spedê wextê tu hati avê ez bo te lı ser bıxwinım. De nıhe bı xatırê te, ezê bıçım ba mêhvanan. Sosın gıhişte hewşa malê, Tacıdin û Bapır malavayi jı Mam Mıhemed û dayika Evdırehman dıkırın. Tacıdin dit ku Sosın lı wêderê rawıstaye, çû nık û bı dengeki xoşwani got:

_ Tu nobedariyê lı me dıdi, Sosın?

_ Erê

_ Bo çi, xwe tu pêşmerge nını, û eger cahış û pasdar ji bên, te tıfeng nine û tu neşêy şer ji bıkıye.

_ Ezê hawar kım, zû bêjme hewe ku hûn bên şerê wane bıken. Xwezi ez kur bama, mınê çawa şer bıkıra. Sosınê lê vegerand. Tacıdin û Bapır pê kenin û Bapır got:

_ Ferqa kıç û kur nine, ew ji dızanın şeri bıken, zana û natırsın. Tacıdin û Bapır jı nav mala derketın û daketıne nav gund. Dıgel dengê seyên gund, pastarên mozelana nav gund, çend tıvengek peqandın. Gelek nekêşa disan bêdengiyek gıran dı ser gund da gırt.

Şefeq bû, dınya hındeki zelal dıbû, rojhılata Gumbetê û Şêx Bazidê jı tirêjên rojê zer û sor bûbû. Dı nav gund da dengê dik û mırişkan, hewtına se û car car

tırpin û gurmina dengê tenekan nişan dıda ku xelk taze jı xew radıbe.

Mam Mıhemed, dıxwast nıvêja xwe ya sıpêdê bıke û pışt ra guhê xwe bıde "Dengê Kurdıstanê". Pışti nıvêjê jına xwe ji şiyar kır, bo ku jê ra taştê dayne. Radiyo vekır , lı ser pêla kurt, lı 75 metıre dengê bılûrê bılınd dıbû.

Sosın dı nav ciyê xwe da nıvıstibû. Dıgel bılındbûna dengê radiyoyê Sosın jı xew rabû û hate nık radeyoyê. Radyoyê dest bı belavkırına xeberên xwe kır. Qısekırê radiyoyê got:

...şımala Kurdıstanê 3 pêşmerge, nerevên hızba me dewera Bradosta lı gundê Meteran da, kevtıne nav gemara hêzên neyarên gel, ewan şervanên gel teslimi pastaran nebûn û hıtani axırin fişengên xwe şer kırın...

Dayik, bab û xûşka Evdırehman, bı bêdengi û bı dıl-lerızi lı benda xwendına navên şehidan hızbê û gel bûn.

"Dengê Kurdıstanê" berdewam kır:

"... Ew egitana dı dawiyê da, gelek mıxabın bı destê wan kırêgırtiyên rejımê şehid dıbın. Navê wan hersê qurbanên malbendên başûrê Kurdıstanê ev ın: 1-Husên Mıhemed-zade, xelkê Somenovê , lı devera Somayê. 2-Evdırehman Ensari, xelkê gundê Gumbetê, lı devera Somayê..."

Dıgel vê xeberê xûşk û dayika Evdırehman dest bı qijin û hawarê kırın. Dengê radiyoyê jı ber şin û gırinê vemırı.

Cinar û nêzikên mam mıhemed bı lez qesta mala wanaa kırın, bızanın ew çı şin e, ew bo çı dıgırin. Yek jı cinarê wana hate pêş û ban kır:

_ Mıhemed, hooo Mıhemed! Kurobabo Xudê xêrke, eve we xûr e? Kesi bersiva wi neda, vêca gundi bı xwe hatın hundur. Ditın ku dayika Evdırehman û xûşka wi çı gezi û por jı xw ra nehêlane, Mam Mıhemed ji lı ber diwar, lı ser qelfiskên xwe bı hêdi û tenahi dıgıriya.

Disan Mam Omer gotê:

_ Erê babo we xêr e? Hûn bo nabêjıne me, çı şin û gıri ye?..

Sosınê bı çavên pır bı rondık, bı dıleki bırin û bı iske-isk şehidbûna kekê xwe jı wan ra got.

_ Kê ev xebera gote hewe? Bagerê gotê.

_ Radyoyê got. Sê kes bûne, şereki baş kırıne, êxsiri wan nebûne. Gelek jı wana kuştıne, fişengên wana xılas bûne. Mam Mıhemed jı Bagerê û gundiyan ra qala bûyerê kır, lı kiderê û çawa bûye yek yek jı wan ra gotınên radiyoyê got. Mam Omer, wek pêşmergeyeki kevn qala jiyana xwe ya pêşmergatiyê kır, pesnê merxasên welat pêşmergeyên Kurdıstanê dıkır. Dayika Evdırehman straneke şinê lı ser kurê xwe dıxwen. Jın û kesên cinar ji tevi şin a wan bûn. Nêrgızê ji ev xebera reş bıhistıbû, jı taxet ketıbû, dıgıriya. Hemû gundiyan dızanin ew jı ber kê û çıma ewqas bı dılşewati dıgıri.

Mam Mıhemed zıvıri ser mam Omer û got:

_ Omer xwezi mın kureki dın ji heba ku mın hınartıba bo pêşmergatiyê. Ez çı bıkım, ez pir ım, neşêm, eve pirejın e û kıçıkê bêxudan bıhêlım...

Çend rojek borin, rojekê lı ser kaniyê, Nêrgızê gote Sosınê:

_ Sosın tu dızani ez sondxwariya kekê te me; ez an bo wi me, an ji bo evê axê.

_ Taze bırakê mın şehid bû.

_ We nebêje, ew nemıriye; ew dı nav dılê mın da dıjitın.

osın ez herıma çiya, ezê bıçım çeka kekê te rakım, bıbım pêşmerga, qewlê xwe binıme cıh. Wek Zinê bıgıhıme Memê xwe...

Hıneki bêdeng bûn, herduka berê xwe danê hev û yek rondık jı çavên wan hatın xwarê. Sosınê gotê:

_ Nêrgız ezê ji bêm. Ez dıxwazım bıbım pêşmerge. Ewê şevöû Bapir dıgot ku pêşmergeyên kıç hene, hım zana û hım ji şerker ın. Babê mın ji dıgot xwezi mın kureki dın heba.

Nêrgızê got:

Şevê di şıvanê me hatıbû, nan jı nav gundi xırkır, bır bo pışta Şêx Bazid, pêşmergeyên "Hêza Agırı" hatıne. Ez ev şev dıgel şıvanê me bıçım.

_ Kengê? Sosınê got.

_ Pışti şivxwarınê. Baş e, ezê hıngê bı haceta mala hewe bême ser kahniyê û jı wêrê bıçıne dolê (newal), şıvanê me lı ser pırê, lı hivya mın e. Wi qewl daye.

Sosınê nameyek nıvisi jı babê xwe ra:

"Babo, dadê, ez bı dıleki bırin û bı kul, malavayê jı hewe dıkım. Her çend ez kıç ım, te dıgot xwezi mın kurek heba bo pêşmergatiyê... Lê mın hewce zani ez herım çeka ar û namûsê, çeka kekê xwe rakım. Babo û dadê mın aza bıkın. Leyla ji kıç bû... Dıbûjın "Şêr şêr e, çı jın be çı mêr be". Babo ez qewl û soz dıdım ku ez we serşor û şermizar nakem, yan serdıkevın an ji dıçıme nık kekê xwe. Ez û Nêrgız dıgel hev ın. Bı xatıra hewe. Sosın."

□

KERSTIN ERLANSSON-SVEVAR

# "WELATÊ MIN DI DILÊ DILÊ MIN DA YE"/2

(Dema ku Reşo dest bı xeberdanê dıke pêra ji lı ser êşkence, gırtigeh û wd. dia tên nişandan)

Jı ber ku ez Kurd ım û dıxwazım xwe wek Kurd bı navkım, Lena, wê çaxê dıvê ez bırevım, lewra tê zanıbi ku "Kurd tune" ne. Hukumeta Tırkiyê weha dıbêje: "Kurd tune ne. Jı ber ku Kurd tune ne tışteki munaqeşê ji tune." Lê tenê lı Tırkiyê, hejmara Kurdan 12 milyon ın. Tevi viya ji, dengê me bı zorê tê fetısandın, lê em dengê xwe nabırın. Em jı bo serxwebûna Kurdıstanê şer dıkın.

FERHAD- Tê pê zanıbi ku axaftına zımanê dayikê wek sûceki tê hesabkırın. Ew dıxwazın bir û baweriyên me yên azadiyê bı êşkence, çek, zorê û xwinê bıdın sekınandın. Lê ew ê bı ser nekevın! Tu car û hiç wexteki! Em ê jı bo parastına çand, zıman û heyiyên xwe şer bıkın.

REŞO- Ez bı xwe, lı gundê xwe yê bıçûk endamê partiyek politik bûm. Em mecbûrê xebata dızi bûn, lê polêsên sıvil û eskeran avêt ser gundê me û hemû gundiyan lı meydana gund cıvandın. Lı pêşberi hemû gundiyan, ez hatım êşkencekırın. Mın çiptazi lı ser dıritêlan, bı bazdan, bırın û anin, bırın û anin. Paşê ez şeş sal dı gırtigehê da razam. (Diayên êşkencê tên nişandan)

LENA- Tışteki tırsehêz e!

FERHAD- Lê te pışti gırtigehê xebata xwe ya siyasi domand.

REŞO- Belê, lê xweveşartın bı her awayi dıjwartır bûbû. Ajan, polêsên sıvil û esker her deri gırtıbûn.

FATÊ- Em jı heqê derxıstına pas û viza sexte derketın.

REŞO- Dû ra me, jı bo reva xwe bertil da polêsê balafırgehê.

FERHAD- Dema ku jiyana mırov bıkeve xeterê, mırov dıreve.

FATÊ- Me jı bo Swêd bıryara xwe da.

REŞO- Belê, me bıhist ku gelê Swêd jı mırovên welatên bındest hezdıkın. (Dıstrê)

WELATEK

Lı welat jı bo azadi rêke dırêj dıvê,
lı wê derê dewlet zımanê te qebûl nake,
Pêşeroj welat bû, dema ku bıçûk bûn em.
Nıha parçe bûye ew welat jı şer.

Dı destpêkê da me fam nekır çawa hatiye danin.
Me bı koriti cih gırt, lı gel masa êşkencê.
Dı dawiyê da jı bırçibûnê helak bûn,
Tibûn hat pışti gotınên bêkêr.

Tım welatek dıgere dı xewnên mın da,
welatek ku bêriya havin, zıvıstan, bıharên wê dıkım.
ew welat xwedi bihnek e ku carna bı bir tinım.
Dılê mın şax dıde jı welatê mın.

Tenê yek navek ku dıçırıse fanosek mezın,
welatek ku dızane sıbe roni dıbe,
Lı wê welatê piyên mın dıxwaze dı nav mêrg û qûmê da bıgere,
ew welatê ku jê hez dıkım, welatê mın!
Ew welat dı dılê mın da ye,

ew welatê ku jê hez dıkım, welatê mın,
welatê dılê mın!

LENA- (Rûdınê û dıfıkıre)

FATÊ- Çıma insan weha zalım ın?

FERHAD- Hemû ne xerab ın. Em hêviya xwe qet wında nakın. Gere lı dıj xerabiyê şer bête kırın. Ez ê rojekê...

NALİN- Jı ber vê yekê ye ku, tu dıxwazi vegeri Kurdıstanê, Ferhad? Belê ev e. (Ferhad serê xwe dıhejine) Hıngê dıbe ku tu bımri, Ferhad!

FERHAD- Erê rast e... Lê ihtiyaciya mın bı wê derê heye. Lı vê derê dıjwar e ku mırov bıkarıbe tıştеki bıke. Nıha pısmamê mın dı gırtigehê da ye û kes nızane ka çı dıqewıme, kes nıkare wi bıbine.

Bı vê hawê ye. Mırov, pıştı gelek dıjwariyan dıkare gırtiyên gırtigehan bıbine. Mırov nıkare û ne xwedi wê sıhûdê ye ku bıkarıbe zımanê xwe biaxıfe. Û tevi ku gelek jê bı Tırki ji nızanın. Mırov jı bo 15 deqe hevdıtina merıvê xwe, seriya hezar kilometır rê dıçe. Û her weha mırov nıkare zımanê xwe bı kar bine.

LENA- Ez ecêbmayi dıminım, ku çawa tıştên weha dıbe!

FATÊ- Belê, mıxabın ku dıbe! **(Navbır)**

FATÊ- Çayek dın ji dıxwazi, Lena?

LENA- Na spas, mıxabın ku gere ez zû herım. Sıbê imtihana me ya biyolojiyê heye.

NALİN- Lena, ez jı te ra straneki bıxwinım?

LENA- Lê çawa, ez ê pê dılxweş bıbım.

NALİN- (Straneke Kurdi dıxwine û tevi malbata xwe dılize. Lena jı bo hinbûnê dıcehdine.)

LENA- Oxx, çıqas xweş e! Spas, ku we rê jı bo hatına mın da.

FATÊ- Lê te tenê tıştên ne xweş bıhist.

LENA- Wısa nebêje! Jı bo mın, guhdarikırına serhatiya we gelek gıring e. Nıha ez çêtır têdıgıhêm. Bı xatırê we! Jı bo çay gelek spas! (Nalin bersing dıke) Merıv bı Kurdi çawa dıbê "hey do"?

FERHAD- Tê bêji "bı xatırê we", em ê ji wek bersiv bıbêjın "oxır be".

LENA- Bı xatırê we!

NALİN- (Dest lı ser porê Lena gerand) Tu xweşık i.

LENA- **Tu** xeşık i. (Destê xwe lı rûyê Nalin dıgerine)

FERHAD- Ez ji wek Nalin dıfıkırım. Ez lı dû Lena dıçım derva. (Ferhad bı destê Lena dıgıre) Oxır be! Em hevdu dıbinın. Sıbê. Û dotıra rojê. Û ya dın.

LENA- Em hevdu dıbinın.

FATÊ- Keçıkeke delal bû, lê ez hêvidar ım ku dılê Ferhad zêde nekevê. Ev rewşa han mın dıtırsine.

Jiyana Mın Sergêjayiyek e

1- Ez emin bûm û zanıbûm çı dıxwazım,
Mın nıkarıbû bı hêsani berê xwe bıda cihe-
ki
Lê jı iro pêda tu keti jiyana mın
ez sıst bûm û germ
gava te bı destê mın gırt.

Mın dıgo qey hezkırın jı bo hın kesên dın e
Gere mın fam bıkıra ku ew dı dılê mın da
radızê
Hemû tıştên ku tu dıki û dıbêji, bû xwedi
buhayeki taybeti
û çavê te dıbine
ku tıştеki dıbe
Gava em hevdu dıbinın lı ber derê hesın
germ dıbe hınarên rûyê mın
û ez sor û gızri dıbım.
Evini çı kor e!
Jiyana mın sergêjayiyek e
têda tu tıştеki lı hev nanıhêre.
Tıştê heri basit wê bı temami bıbe kareki
bı serê xwe
Bêhuzûriya mın, bala mın jı hev belav
dıke
Wek bı jehrê ketıbım ez!

2- Yê ku careki bı agır leyist û xwe
şewıtand
belki ew, ewıl xwe dıparêze yan ji jı bir
dıke.
Gerek mırov şaşiyeki weha qet neke,
dıvê mırov hini xweparastınê bıbe.

Tevi her tıştі ez lı piya me û bırûsk lê
dıxe.

Gere dılê mın têderxısta û sinyala balkışandınê bıda

Ez bı temami bêçare bûm.
Nıha jı bo te dışewıtım.
Mın fam û wezna xwe wında kır.
Ditınên hevalên mın:
Ew bı his û şermok e
û mın têderxıst ku tu bı dızi lı mın dınıhêri.
(Vegerin)

3

DAYİK- Tê bı kuda heri?

LENA- Derva.

DAYİK- Ez hêvidar ım ku tê negıhiji wi Kurdê han. Mın jı xanıma Svenson bıhist ku...

LENA- Ez ki bıxwazım, ez ê pêra bım.

DAYİK- Tu dızani ku ez û bavê te çı dıfıkırın. Gelek xortên Swêdi yên baş hene. Bı rasti ihtiyaciya te tune...

LENA- Dayê! De bes e lê!

BAV- (Bavê Lena tevi pırtûka destê xwe tê hundır) Bı ser diya xwe ra neqire, Lena! (Dıqire) Tu dızani ku ez jı qêrinê nefret dıkım.

LENA- Erê lê, diya mın dıbêje...

DAYİK- Lê, ew lı derdorên bajêr bı wi Kurdê ra dıgere.

BAV- Lena, me bıryar daye ku hûn ê nıkarıbın hevdu bıbinın.

LENA- We bıryar daye, ne mın!

BAV- (Jı bo gırtına mılên Lena decehdine) Lena, ez te nas nakım.

LENA- (Bı hêrs destê bavê xwe jı xwe dûr dıke) Mın rehet bıhêle!

DAYİK- Lena, tu dızani ku xelk çawa xeber dıde.

LENA- Yeki ku xeber bıde, ew ji tu yi, dayê.

BAV- Êdi dengê xwe bıbıre, Lena! Gerek tu fam bıki ku ew Kurdên han cıhê ne. Wek ku tu ji zani ew xwedi toreyên xwe ne û...em û wan bı hev nakevın, nıkarın bı hevra bıjin. Her weha, mesele bı vi hawê ye. Ew jı cısneke dınê ne. Ez bı xwe tışteki jı wan fam nakım.

LENA- Te, xwe jı bo famkırınê cerıbandiye, bavo? Te cerıbandiye?

BAV- Çı bêjım...na...ne wısa rasterast...

DAYİK- Em kesi jı wan nas nakın...

LENA- Dengê xwe bıbıre û nebêje ew kesa-na!..

DAYİK- Ûşşş, tu çı tûre û bêsebır bûyi, Lena. Merıv newêre lı ba te devê xwe veke.

LENA- Wê çaxê neke!

DAYİK- Êdi ez û bavê te naxwazın dı derheqa wi... derheqa lawık da tışteki bıbıhizın! Û naxwazın ku tu pêra bi, te fam kır...

LENA- Ez êdi nıkarım te guhdari bıkım, dayê! Ez jı Ferhad hez dıkım û ne tu, ne bavê mın ne ji ew gılibêjên vır ên bajêr nıkarın viya bıguhurinın.

BAV- Ez û diya te tenê te dıfıkırın û jı bo te dıtırsın, Lena.

BAV- Em naxwazın ku tışteki bı te bıbe, Lena.

LENA- Û wê bo çı nışkava û nıha tışteki bıbe? Gava ku mın bı Thomas ra hevalti dıkır, we yek gotıneki negot.

DAYİK- Lê tu ji zani, ku evya cıhê ye. Thomas Swêdi ye.

LENA- Wek tu ji dızani tu bêhêvi yi, dayê!

BAV- Ez û diya te xwedi jiyaneke bı tecrûbe ne,

(Dayik serê xwar dıke)

LENA- Eger hûn ewqas zana ne, çıma dı derheqa Kurdan da tışteki nızanın?

BAV- Eger mırov rastiyê bıbêje, ew dı dereca kêmtırin da ji bala mın nakşinın. (Pêra ji radıke weşiyeke bexdenûs û dıcû.)

LENA- Tu tevi kêşa pırtûkên xwe yên gemari lı ser tıştên xwe yên antik rûdınêyi. Tu nızani ku çı lı der-dora te dıqewıme. Tu dızani ku, gava Ferhad û merıvên wi reviyane çawa jiyana xwe kırıne xeterê? Tu pê dızani?

DAYİK- Herê lê, wê werın Swêd çı bıkın? Ez tênagıhijım ku wê çı bıkın.

LENA- Of, dayê, dıvê te pê bızanıbûya ku çı tê serê wan, gava ew jı bo derketına dervayi welat dıcehdının. (Dayik bêbalkêşi radıke mırişkê) Guhdari ke, dayê!

DAYİK- Erê Erê.

LENA- Gava xaltiya Azad jı sinorê mayinkıri derbas dıbe zarok jı berê dıçe. Wê tevi zarok eşyayeki dın ji hılgırtiye. Devê zarokê bı şara stuyê xwe pêçaye da ku nobedarên sinor bı gırina zarok nehısın. Wê, dı rê da zarokê xwe xıstiye û pê nehısiyaye, dayê. Xema tırsê û heyecanê hemû bala wê kışandiye. Gava ew

pê dıhesın ku zarok wında bûye, êdi newêrın paşda vegerın. Dıbe ku nobedar wana bıditana û gullebaran bıkırana. Wê zarokê xwe yê pıçûk wındakır, dayê!

DAYİK- Te ev agahdariya jı kuderê gırt, Lena?

BAV- Qey tu mecbûri çirokên weha yên eşqiyayi jı diya xwe ra bıbêji. Tu dızani ku ew çawa xemgin dıbe.

LENA- Çirokên eşqiyayi! Tıştê kı mın got rast e.! Gotın bı gotın rast e! Ferhat behs kır.

BAV- Her tıştên ku xelk dıbêje bawer neke, Lena.

LENA- Hûn kêmaqıl ın! Nıha ez dıçım! Û ez ê bıgıhijım Ferhad, jı ber ku ez jê hez dıkım. We bıhist! Ez jê hez dıkım! (Xwe davêje derva. Herdu bı hevra dıstırên û lı hev vedıgerının.)

<u>Strana Ferhad</u>

Merıv ecêb dıtırse ku wek evdalok bête xuyan,
jı xwewındakırınê dıtırse.
Mın dıgot qey ne mumkun e,
fıkra hezkırınê dı mın da bı cih bıbe.

Ez şermok û rasterast paşdamayi me,
dı nav xelkê da me, bê deng.
Jı roja ku me hevdu dit vırda,
bêriya ramûsanê dıke lêvên mın.

(Veger) - Pıçek sırdayi, cıddi raketi

Hemû tıştên ku derheqa dıbêjın rast e.
Nerm e mizaca te, bı fam û fıraset,
Tu şahane yi, hım xweşık hım ji şirin,
Belê, em dıkarıbûn bıbûna cotek.

Tu têyi xuyan wek merıvek gıhandi,
tevi ku tu wek mın cıwan i.
Lê tê bıkarıbi jı mın hezki û dılsoz bi
Çaxa jiyan derb û sile dadıweşine?
Lı ser pozê te çerm heye û serbılınd têyi xuyan.
Ez dıxwazım bı her awayi bı te bawer bım.
Gelo evindariya ewıl her dem weha xweş e,
jı bo keç û xortan?

**Werger:** DILSOZ

## Komcıvina 35: em a Asambleya Yekitiya Ewrûpaya Rojava

# "JI BO KURDAN XUDMUXTARİYA İDARİ Û ÇANDİ "

Dı 6'ê Çıriya Paşin a 1989'an da komcıvina 35:em a Asambleya Yekitiya Ewrûpaya Rojava hate çêkırın. Berya komcıvinê jı aliyê Komisyona Karên Gelemperi raporek hatıbû amadekırın. Dı raporê da lıgel pırsgırêkên Ewrûpa, Rojhılata Nêzik û Rojhılata Navin pırsa Kurdan ji, wek babetek sereke cih gırtıbû. Lı ser babeta çarelêkırına pırsa Kurdan, wek pêşniyar bıryarek jı bo komcıvinê hate pêşkêşkırın. Dı bıryara pêşniyar da daxwazi weha hatıbû formulekırın: " Ew dewletên ku Kurd lê hene, dıvê xudmuxtariya idari û çandi bıdın Kurdan."

Komcıvin, bı tevayiya dengan ev pêşniyara pêşkêşkıri wek bıryar qebûl kırın.

Dı komcıvina Asambleyê da şeş parlamenterên Tırkiyê ji beşdar bûbûn. Heyeta Tırk, jı parlamenterên ANAP, DYP û SHP pêk hatıbû. Balkêş e ku dı nav heyetê da yên ku bêtır dewleta Tırk dıparêzın û astengi lı pêşiya bıryarê derdıxın, parlamenterên SHP ne. Herdu parlamenterên SHP'ê ji, bı eslê xwe **"Kurd"** ın û dı cıvinê da wısa "xiret" nişan dıdın ku, serekê heyeta Tırk ji dora axaftına xwe dıde wan. Parlamenterên SHP'ê **Fuat Atalay** û **Hikmet Çetin** ên xwefıroş, iddia dıkın ku, "Lı gor peymana Lozanê, lı

Tırkiyê, Kurd wek hûrgel nehatıne qebûlkırın û jı ber vê yekê ji rewşa Kurdên Tırkiyê jı rewşa Kurdên Iraq û İranê cuda ye." Û lı dıj vê bıryarê radıwestın.

Gotıneke me ya pêşiya heye: **"Kedkıro jı xelkê ra."** Herdu parlamenterên me yên "Kurd" ji, jı bo dewleta Tırk a zordest, çı jı destê wan hatê kırın, lê reziliya wan pere nekır û lı ser pırsa Kurdan, bı tevayiya dengan bıryara dayina "xudmuxtariya idari û çandi" hate qebûlkırın.

Pışti bıryarê **Hikmet Çetin**, xwe geleki acız dıke û bıryarê weha şırovedıke: "Ev bıryar tê wê manê ku, hûn têkeli karên Tırkiyê yên hundıri dıbın." Lê jı parlamenterê Fransayê Jean Marie Caro (ku kevneserokê Asambleyê bû), weha bersiva xwe dıstine: **"Behsa ihlalkırına mafên mırovi, nayê mana têkıliya karê hundırê welateki."**

## Doktor bangi doktoran dıke:

# Alikariya bındestan bıkın!



**Dr. Jonathan E Fine, şerê kimyayi ê İraqê lı dıji sivilên Kurd, dışêbine qetliamên nazistan. Ew doktorên Şileyê rûreş dıke ku dı êşkencekırınan da, alikariya karbıdestên rejimê kırıne.**

Dr. J. E Fine, ku dı meha 11'an da hatıbû Stockholm, yek jı wan doktoran e ku dı avakırına rêxıstına "Doktorên dıji çekên atomi " da beşdar bûye. Vê rêxıstınê dı sala 1985'an da xelata Nobel a aştiyê wergırtıbû. Herweha wi dı sala 1987'an da, lı Amerikayê pêşengiya rêxıstıneke nû kır: "Physicians for Human Rights" bı Kurdi doktorên jı bo mafên mırovi.

Bı hezaran endamên vê rêxıstınê hene. Armanca wan ew e ku, bı saya zanin û tecruba xwe a dı warê medisin û psikolojiyê da, lêkolinan çêkın û hewl bıdın ku rê lı ber curmên dıji mafên mırovi bıgrın. Dı vi wari da wan heta nıha 22 xebat pêkanine. Heta iro heyetên doktoran şandıne 11 welatan. Pışti ku grûbek doktorên vê rêxıstınê, bı raporên xwe zordesti û êşkenceyên sistematik ku lı Sahara Rojava lı filistiniya tên kırın, aşkere kırın, bala dınyayê bı xurti kışandın ser pırsa Filistinê. Doktor Jonathan E Fine, dıbêje:

_ Dı meslekê xwe da bêalibûna siyasi a doktoran pêwist e, û ew jı bo vê yekê dıcehdinın. Mırov dıkare bı saya grûbeke ekspert, delilên geleki gıring derxe ronahiyê.

_ Em çûne İsrailê, lê em çûne İraqê ji, bo ku rewşa Kurdan bı çavê xwe bıbinın, bızanın. Hukumeta İraqê lı dıji nufûsê xwe jehrê bı kar tine. Dıvê mırov paşda vegerine ser qampên nazistan , bo ku bıkarıbe wehşeteke bı vi rengi bıbine.

_ Sedemê hatına mın a Swêd, jı ber vê yekê ye ku lı vi welati eleqeyeke mezın heye jı bo mafên mırovi.

_ Ez dxwazım jı doktorên swêdi tıka bıkım ku em bı zanin û tecrubên xwe bı hevra bıxebıtın, bona ispatkırın û pêşilêgırtına sûcên dıji mafên mırovi.

*Jı nıvisa G. Ahrèn, nûçegihanê rojnama swêdi DN hatiye wergırtın. Me bı kurtebıri wergerand.*



# ZAROK



TOLSTOY

Werger jı Tırki: X. LEZGİN

## Şêr û Seyê Bıçûk

Lı bajareki mezın, pêşandana heywanên hov hebû. Jı bo temaşekırınê gerek xelkê bılêt bıstandana yan ji bı xwe ra pısikek yan ji seyek(kûçık) bıaniyana bo ku wek xwarın bavêtana ber heywanên hov.

Mıroveki ji dıxwest here pêşangehê û heywanên hov bıbine. Lema lı ser zıqaqê seyeki cewrık gırt û bıre cem serwerê pêşangehê. Cewrık avêtın hundurê qefesê ber şêr û ew mırova ji berdane hundur.

Seyê cewrık doçıka xwe (dêla xwe) xıste nav lıngên xwe û çû lı quncıkeki sekıni û xwe quncıloki kır, mina ku dıxwest xwe veşêre. Lê şêr ew ditıbû. Şêr nêziki wi bû û ew bihn kır.

Hıngê cewrıkê belengaz xwe lı ser pıştê avêt, lıngên xwe bılındi hewa kır û doçıka xwe lı ba kir.

Şêr bı pençêyên xwe hêdika ew zıvırand û serzıkki dani.

Seyê bıçûk, jı cihê xwe quloz bû, rabû ser xwe. Lı ser lıngên paşiyê rûnışt.

Şêr, lı seyê bıçûk nıhêri, serê xwe hejand lê êdi têkıli wi nebû. Dema seyisê şêr parçegoşteki mezın avête ber şêr, şêr çû ew goşt parçe-parçe kır û parçek dani pêşiya seyê bıçûk.

Dema bû êvar û êdi şêr dıkır ku rakeve, cewrık çû nêziki şêr bû, serê xwe dani ser pençeyê şêr û dı xew da çû.

Jı wê rojê şûnda şêr û se dı qefesê da tevayi jiyan. Şêr qet zordesti lı wi nedıkır. Zırar nedıda wi. Xwarına xwe dıxwar, cewrıka bıçûk dıbıre ba xwe û radıza. Carna ji pê ra dıleyist.

Rojeki serwereki pêşangehê bı mıroveki va hatın. Ew mêrıka xwediyê seyi bû, dıxwest wi bıbe. Serwer dıxwest kûçıkê mêrık bıdê. Bı hevra çûn ba qefesê, seyê bıçûk derxıstın derva, lê şêr dı cih da hêz da xwe, rabû bı dengeki stûr gırıji. Bıjiyên wi gıj bûbûn.

Cewrıkê bıçûk û şêr, tam saleki bı hevra dı qefeseki da jiyan.

Dawiya wê salê ew kûçıkê bıçûk nexweş ket û mır. Şêr geleki xemgin bû. Jı xwarın vexwarınê bûbû. Dıçû dı ser laşê seyê bıçûk ra dısekıni ew bihn dıkır, dıalast, bı pençeyên xwe ew mızdıda.

Dema şêr fehm kır ku ew mıriye, nışkava har bû. Nızanıbû çı bıke. Bıjiyên wi gıj bûbûn. Dêla xwe lı vê hêlê lı wê hêlê dıxıst. Xwe hıldavêt lı caxên qefesê dıxıst, mina ku dıxwest qefesê bışkêne.


Wê rojê heta êvarê şêr gırıji, dı ciyê xwe da doş bû, êrışi caxên qefesê kır. Dı dawiyê da xwe lı kêleka seyê bıçûk velezand.

Serwer dıxwest seyê bıçûk jı qefesê derxe, lê şêr nedıhişt kesek nêziki wi bıbe.

Paşê fıkrek hate hışê serwer. Ani seyeki sax avête hundurê qefesê. Wi hêvi dıkır ku, şêr, wê bı hatına seyê nû xem û êşa dılê xwe jı bir bıkıra. Lê çı çare! Şêr bı pençeyeki ew cewrık parçe kır û avêt. Paşê ji çû xwe lı ba hevalê xwe yê kevn dırêj kır.

Şêr pençeyên xwe lı seyê bıçûk pêça û ew da ber pêsira xwe. û pênc roja wısa bêdeng û bêlıvin dı ciyê xwe da sekıni. Roja şeşan ew şêrê mezın ji mırıbû. ■

## Gelo Hûn Dıkarın Navê van Heywanan bınıvisın?



# ROJA NÛ
# CİLT 2
derket




**ESKERÊ BOYİK**

# MEM
# Û
# ZİN

**Drama jı pênc perdan**

WEŞANÊN ROJA NÛ

Drama jı pênc perdan

# MEM
# Û
# ZİN

Derket

BIHA: 10 Skr